

## PKD li Almanya, Swisre û

### Avusturyayê bû

"Komara tirk xwe nade ber tu çareseriyên û şerê gemarî her diçe gurtir dike. Eger kurdan dest bi tevgera azadiyê nekira û PKK tunebûya, dinyayê heta 50 salî jî dengê kurdan nedibihîst. Gelê kurd êdî malên xwe ne bi wêneyên qehremanên biyan yên Kubayê, Ceza-yirê dixemlînin."

Rûpel 3

## Çiroka jiyana Mistoyê ku ji diya xwe bêdeng ket

Misto li ber neynikê bêdeng û bi tenê rawestiya bû, keldûman jê diçû. Di nav dûmanê de mat mabû. Bi berbangê re ji xew vecinîqî, xuş-xuş ji serê wî dihat. Laşê wî sincirî bû. Bilez çû ber neynikê û li xwe nêrî: -Yadêêêê... ev çi ye?

Rûpel 12

## 'Gelê kurd barê giran ji ser piştta xwe avêtiye'

Piştî ku em ketin nav doza nû, bêhtir me xwe nas kir. Têkoşîna ku me ewçend sal li Kurdîstana Başûr dabû, em lê poşman bûn. Ji ber ku doza Başûr ji bo menfaeta beg, şêx û axan bû, ne ji bo gelê kurd bû. Belê me li ser navê gelê kurd û Kurdîstanê têkoşîn dikir, lê em bi kêrî beg, şêx û axan dihatin. Rişma me di destê wan de bû...

Rûpel 16

## The European: Kurd cezayê mirinê didin tûrîzmê

Di sala 1994'an de 2.5 milyon tûrist çûne Tirkîyeyê ku nivî wan almanî bûne û wan kesên 4.5 milyar pere li dû xwe hiştine. Aboriya Tirkîyeyê ya qels pir bi dijwarî kare bixebite, heke ev pere ji dest biçin. Tirkîye bi hindikayî salê 6.5 milyar dolarî li şer xerc dike. Ev pereyên ku li şer diçin, dibin sedema enf-lasyona bilind.

Rûpel 5


ROJNAMEYA HEFTEYÎ

SAL: 1 HEJMAR: 31

18 PÛŞPER 1995

BUHA: 40.000 TL(KDVD)

# 'Di nivîsandina dîroka kurdî de zêde romantîzm heye'



Lêkolînerê çand û zimanê kurdî Gurdal Aksoy, li ser kêmasiyên ku di warê çand û dîroka kurdî de tên kirin, sekinî

● Di van mehên paşî de li ser "romana kurdî" gelek gotûbêj hatine kirin. Bi rastî jî romana kurdî zehf girîng e. Lê dîroka kurdî jê girîngtir e. Divê pêşî "dîroka kurdî" ango "dîroka kurdan" bête nivîsandin. Dema ku kurd dîroka xwe binivîsin, wê çaxê wê bikarin romana xwe, şanoya xwe, hunera xwe û hemû fiştên din jî binivîsin.

Rûpel 8-9

## Kêfa dewleta tirk ji demokrasiyê re nayê

Rojeva Tirkîyeyê, bi hatina havînê germ bû. Biryar, heyet û raporên Ewrûpayê rayedarên tirk bêzar dikin.

- Tirkîye, ji bo ketina nav Yekîtiya Gumrukê rojan dijmêre. Li gorî prosedura ku Tirkîyeyê bi dewletên Ewrûpayê re di 6'ê adarê de çêkir, divêt heta sersala 1996'an li Tirkîyeyê gelek kêmasiyên ku di warê demokratîkbûn û aboriyê de hene, bînin helkîrin.
- Yekîtiya Parlementerên Ewrûpayê raporek li ser Tirkîyeyê weşand. Di raporê de bi giranî li ser rewşa kurdên Tirkîyeyê û statuya wan hate sekinîn. Li gorî raporê, divêt mafên kurdan yê kulturî û îdarî bînin dayîn. Ev daxwaz, wek otonomiyê dikare bê şîrovekirin.

Rûpel 2



## Ji zarokên NÇM'ê defîleya kincên neteweyî

- Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM), li Stenbolê şahiyek li dar xist. Şahî, ji aliyê Yekîtiya Malbatên Mezopotamyayê ve, ji bo tatîla zarokên ku li navendê perwerdehiyê dibînin, hatibû organîzekirin.
- Zarokên ku di nav salê de beşdarî xebatan bûbûn, ji berpirsiyariya NÇM'ê sertifikayên xwe standin. Li hêla din, di şahiyê de NÇM'ê mizgîniya Konferansa Zarokên Kurd jî da.

Rûpel 13



Rojeva Tirkîyeyê bi hatina havînê, germ bû. Biryar, heyet û raporên Ewrûpayê rayedarên tirk aciz dikin

# Kêfa dewleta tirk ji demokrasiyê re nayê

**Tirkîye, ji bo ketina nav Yekîtiya Gumrukê, rojan dijmêre. Li gorî prosedura ku Tirkîyeyê bi dewletên Ewrûpayê re di 6'ê adarê de çêkir, divêt heta sersala 1996'an li Tirkîyeyê gelek kêmasiyên ku di warê demokratîkbûn û aboriyê de hene, bên halkirin. Yekîtiya Parlementerên Ewrûpaya Rojava, di nav heftiya borîn de raporek li ser Tirkîyeyê weşand. Di raporê de bi giranî li ser rewşa kurdên Tirkîyeyê û statuya wan hate sekinîn. Li gorî raporê, divêt mafên kurdan yên kulturî û îdarî bên dayîn. Li gorî derdorên siyasî, ev daxwaza Yekîtiya Parlementerên Ewrûpaya Rojava, wekî otonomiyê dikare bê şirovekirin.**

lek kêmasiyên ku di warê demokratîkbûn û aboriyê de hene, bên halkirin. Teqwîma ku dewletên Ewrûpayê danîne ber Tirkîyeyê nemeşiya û sozên ku hikûmeta koalîsyonê dabûn dewletên rojavayî pêk nehatin.

Di nav heftiya borîn de navê Tirkîyeyê di rojeva dewletên rojavayî de bû. Di nav heftiyê de encama gelek raporên diyar bû. Yek ji van jî ya Yekîtiya Parlementerên Ewrûpaya Rojava bû. Di raporê de bi giranî li ser rewşa kurdên Tirkîyeyê û statuya wan hate sekinîn. Li gorî raporê, divêt mafên kurdan yên kulturî û îdarî bên dayîn. Li gorî derdorên siyasî, ev daxwaza Yekîtiya Parlementerên Ewrûpaya Rojava, wekî otonomiyê dikare bê şirovekirin. Yanî êdî rêxistinên Ewrûpayê yên herî mezin jî pirs-girêka kurdan xistin rojeva xwe û dema têkiliyên bi Tirkîyeyê re, çî siyasî û çî jî aborî, meseleya kurdî cihê sereke digire.

## Berdana DEP'yan şert e

Li hêla din Parlemantoya Ewrûpayê di civîna xwe ya 13'ê pûşperê (hezîran) de der heqê endambûna Tirkîyeyê ya



P. Green, C. Roth û C. Lalumiere di gera xwe de mebûsên DEP'ê li hepsê ziyaret kiribû.

Yekîtiya Gumrukê de, bi 414 dangan biryarek stand. Li gorî biryarê, eger Tirkîye mebûsên DEP'ê yên girtî bernede, ji bo ketina Yekîtiya Gumrukê, ew destûrê nadin. Ev biryar, wekî tawsiyakê wê pêşkêşî Zîrveya Cannes ya Yekîtiya Ewrûpa bibe. Di vê biryarê de bi tenê berdana mebûsan pêwîst nayê dîtîn û tê gotin ku divêt mafên kurdan jî were dayîn.

Her çiqas ew rêxistin wiha rasterast nikaribin

tesîreke madî li ser Tirkîyeyê bikin jî, ew wekî wijdanê Ewrûpayê tên nixandîn û di demeke kurt de tesîrê li ser hikûmetên Ewrûpayê dikin.

## Skandala

### Ayvaz Gökdemir

Di vê dema ku derbarê ketina Tirkîyeyê ya Yekîtiya Gumrukê de gelek biryar tên dayîn û encama raporên diyar dibe de, li Tirkîyeyê wezîrê dewletê Ayvaz Gökdemir, li ser hatina heyeteke Parlemantoya Ew-

rûpayê gotinên nexweş kirin. Ayvaz Gökdemir, di axavtineke xwe de ji bo sê serokên grûbên Parlemantoya Ewrûpa yên jin got: "Ew "Qah-pik" ji bo perçekirina welatê me tene Tirkîyeyê." Van gotinana, derhal di nav raya giştî ya Ewrûpayê de reaksiyon çêkirin. Jinên ku muxatab bûbûn, Pauline Green, Claudia Roth û Catherine Lalumiere bûn.

Li vir tiştê muhîm ew bû ku niyeta wezîrê hi-

kûmetê, ne ya şexsekî bû. Li aliyekî li gorî beyanatên rayedarên hikûmetê, ew dixwazin tekevin nava Yekîtiya Ewrûpayê û li aliyê din jî wezîrê (li gorî agahiyên ku di rojnemeyên tirk de derketin, gelek burokratên wiha hene), tehemulî heyetan nake. Yanî ew naxwazin hesab bidin heyetên biyan. Ji ber ku roj derbas nabe li Tirkîyeyê gundek nayê şewitandin an jî valakirin, dîsa roj derbas nabe ku cesedê kesekî/e windakirî nayê dîtîn.

Li hêla din, hikûmeta koalîsyonê, ji bo rakirin-guherîna qanûna 8'an a "Têkoşîna bi Terrorê re" li meclîsê qerar stand. Li gorî vê, wê hikûmet ewilî pakêta guherîna 21 qanûnan ji meclîsê derbas bike û dû re jî ji bo qanûna 8'an bixebite. Lê li gorî hiqûqzanan, rakirin an jî guherîna vê qanûnê, wekî makyajekê ye. Li gorî wan, gelek qanûnên din (311 û 312) hene ku ew jî wezîfeya wê qanûnê dibînin. Sebeba ku hikûmet ewçend li ser vê qanûnê disekine, ne ji ber xemên kêmbûna demokrasiyê ye. Lewre, ji ber ku Ewrûpa dixwaze û bêtir guherandina hin qanûnan, ew nikarin tekevin nav Yekîtiya Gumrukê.

Navenda Nûçeyan

KURD-A

## Qanûna Bingehîn a Kurdistanana Federal

Li gorî rojnemeya Yeni Politika, ji bo Kurdistanana Federal, qanûna bingehîn tê amadekirin. Di agahiya rojnemeyê de tê gotin ku ji sê salan bi vir ve hiqûqzanên îngilîz û fransîz li ser qanûna bingehîn dixebitîn.

Qanûna Bingehîn, di bin serokatiya hiqûqzanên îngilîz yên bi nav deng M. Duvager û Endamê Konseya Kraliyeta Îngilîstanê yê berê Patrick Crayton de bi destê komek hiqûqzan tê hazîrkirin. Rojname dide zanîn ku hazîrkirina qanûneke wiha, ji niha ve rika Tirkîyeyê kişandiye ser xwe û Tirkîye jî vê hewldanê aciz e. Herwiha dibêje rojname, ji bo ku di vê berqanûnê de av û heyînen ser û bin erdê Kurdistanê, wekî malê neteweyê tîn binavkirin, Tirkîyeyê ditirsîne. Ji ber vê yekê jî di nav ihtimala de ye ku Tirkîye îlankirina vê qanûnê bide

sekinandin.

Di berqanûnê de çî hene?

Hin madeyên ku di berqanûna Qanûna bingehîn de hene ev in:

- Komara Kurdistanana Federal, welatê ku kurd lê dijîn e.

- Li herêmên ku gelê kurd li ser dijîn, heqên dewleta kurdan yên erd û coxrafi weşarî ne.

- Dewleta kurdan nikare dev ji heqên xwe yên serfirazî û hukumraniyê berde û bi tu dewletên ku nîjada wan ne kurd in re, nikare bi tu awayan yekîtiyê çêke.

- Li ser heyînen ser û bin erdê Kurdistanê, çem û rûbarên wê, li ser tesîsên rezervuar yên potansiyel û derbarê aîdbûna wan a dewleta Kurdistanê, de tu guftûgoyên navneteweyî nayên çêkirin.

Navenda nûçeyan

## 'Ji şerê gemarî re na'

Li Almanyayê, li bajarê Kölnê, di 10'ê pûşperê (hezîran) de şeveke bi navê "Ji çareseriya siyasî re erê, ji şerê gemarî re na" bi beşdariya 9000 hezar kesî li dar ket.

Şev, bi piştgiriya DGB- Köln, SPD- Köln, Grune Bundnis/ 90- Köln, Jusos- Köln, Amnesty International- Köln û Medico Internationalê li dar ket. Di şevê de, li ser navê Parlemantoya Kurdistanê ya Li Derveyî Welêt Xanê Alkan, li ser navê IHD'ya Stenbolê Ercan Kanar, li ser navê rojnemeya Yeni Politikayê A. Kadir Konuk û ji IG-Medienê Jurgen Schon, ji Partiya Keskparêz Annelie Kever-Henselery, ji Medicoyê Hans Brandscheidt, Serokê Sendikaya Petrol-Îşê yê berê Munir Ceylan û ji ERNK'ê Hêlîn axivîn. Gelek sazî, rêxistin û partiyan jî ji şevê re mesaj şandin. Koma Azad (NÇM-Amed), Grup Kızıllırmak, Koma Berxwedan, Koma Lazan ya Rockê Zuğaçberepe, Hozan Aram, Hozan Şehrîbana Kurdî û Hozan Besê jî di şevê de stranên xwe yên gelêrî û şoresgerî ji beşdaran re pêşkêş kirin.

Şev bi dîlanên û bêmudaxeleya polisên alman qediya.






## PKD li Almanyayê, Swisre û Avusturyayê bû

Xebatên Parlamentoya Kurdistanê ya Li Derveyî Welêt (PKD) yê diplomatîk berdewam in. Heyetên PKD'ê li Swisra, Almanyayê û Avusturyayê hevdîtîna û têkiliyên xwe didomînin.


### AVUSTURYA

Heyeta PKD'ê li Avusturyayê, piştî têkilî û hevdîtîna xwe di 8'ê pûşperê de li Viyanayê 'Civîneke Gel' li dar xist. Di civînê de ji her çar perçeyên Kurdistanê temaşevan beşdar bûn. Serokê PKD'ê Yaşar Kaya ji bo çareseriyê dîtîna xwe pêşkêşî beşdaran kir û got ku ew ji gelê kurd qewetê distînin û ji bo pirs-girêkê jî çareseriyê bi aşî û siyasî dixwazin. Di dewama axaftina xwe de jî got:



Remzi Kartal

"Komara tirk xwe nade ber tu çareseriyê û şerê gemarî her diçe gurtir dike. Eger kurdan dest bi tevgera azadiyê nekira û PKK tunebûya, dinyayê heta 50 salî jî dengê kurdan nedibihîst. Gelê kurd êdî malên xwe ne bi wêneyên qehremanên biyan yê Kubayê, Cezayirê dixemlînin. Bi wêneyê Abdulah Öcalan û



Yaşar Kaya

bi wêneyê Mazluman dixemlînin."

### ALMANYA

Endamê Heyeta Kargeriyê Felemez Başboğa li Berlînê, bi Berpirsiyarê Karê Derve yê Artêşa Rizgariya Neteweyî ya Zapatasta (EZLN) Lorenzo Vazquez re hevdîtînek kir. Başboğa di hevdîtîna de der

heqê hereketa azadiyê de agahî dan nûner. Nûnerê EZLN'ê Vazquez jî daxuyand ku ew hereketa kurdan ji nêzik ve teqîp dikin û dixwazin têkiliyên xwe xurtir bikin.

### SWISRE

Cigirê Serokê Heyeta Kargeriyê Remzî Kartal û parlementer Ali Matur li Cenevreyê bi Cigirê Serokê Yekîtiya Parlementerên Dinyayê (IPU) Andres Johnsson re hevdîtînek çêkirin. Johnsson di hevdîtîna de daxuyand ku ew bawer in heta ji pirs-girêka kurdan çareseriyê siyasî çênebe, wê pirs-girêkê bidome. Piştî vê hevdîtîna Kartal û Matur li Baselê beşdarî civîna Partiya Sosyalîst a Swisreyê bûn.

Navenda Nûçeyan

## HADEP'a Stenbolê dîsa bi 'Parlak' berdewam e

Partiya Demokrasî ya Gel (HADEP) di kongreyayê xwe ya yekemîn de dîsa Dr. Kemal Parlak ji bo serokatîyê hilbijart.

Teşkilata HADEP'a Stenbolê, roja 9'ê pûşperê (hezîran) ji bo kongreyayê xwe ya yekemîn li Salona Sporê ya Caferagayê civiya. Di kongreyê de axaftina destpêkê Kemal Parlak kir û got: "Ez ji vir li hemû demokrat û şoreşgerên ku di avakirina HADEP'ê de keda wan heye, li hemû jin û xortên ku piştî didin me û li şehîdan silav dikim." Piştî axaftina Parlak deqî-

qeyek ji bo bîranîna şehîdan, beşdar rabûn ser piyan û pişt re jî marşa kurdan a neteweyî Ey Reqîp xwendin.

Di kongreyê de, Sekreterê Giştî yê HADEP'ê Bahattin Günel, Endamê Meclîsa Partiyê Ahmet Cihan, Serokê Partiya Sosyalîst a Yekbûyî (BSP) yê Stenbolê Erdal Kara û Serokê Sendîkaya Emek-İşê Muzaffer Ünlü jî li ser rewşa Tirkiyeyê û şerê gemarî axivîn.

Piştî nirxandina xebatên salê, di hilbijartinê de Dr. Kemal Parlak cara duyemîn ji bo serokatîya bajêr

hate hilbijartin.

Di civînê de Koma Folklorê Serhildan, (NÇM'ya Amedê) bi govanda xwe, ji NÇM'ya Stenbolê jî Hozan Ganî Nar û Hozan Xanemîr bi stranên xwe beşdar coşandin. Li hêla din, ji bo kongreyê jî Parlamentoya Kurdistanê ya Li Derve, Serokê DEP'ê Hatip



Kemal Parlak

Dicle û parlementerên girtî û gelek sazî û rêxistinên din mesajên serkeftîna hatin.

Navenda Nûçeyan

## Polîs tehemûlî TV-MED'ê nakin

Li Amedê, pênc qehwexane ji ber ku TV-MED'ê didin temaşekirin ji aliyê polîsan ve hatin girtin. Li Taxa Balıkcılarbaşıyê Qehwexaneya Helhel, Lalebey û li dora garaja Sîwerekê jî 3 qehwexane ji aliyê polîsên emniyeta Amedê ve di 8'ê pûşperê de hatin mohrkirin. Xwediyên qehwexaneyan gotin ku karxaneyên wan ji bo 15 rojî hatine mohrkirin.

## Artêşa tirk ji başûrê Kurdistanê venakişe

Di hevdîtîna endamên Heyeta Kargeriyê ya Parlamentoya Kurdistanê Î. Şerîf Wanlî, Ali Matur û Berpirsiyarê Maseya Rojhilata Navîn a Komîseriya Penaberan a Bilind a Navneteweyî (UNHCR) de, nûnerê rêxistinê Muhammet Bukrî daxuyand ku artêşa tirk hê jî ji başûrê Kurdistanê venekişiyaye û rê nade ku rêxistin jî alîkariyê bide penaberan.

## Başkaya keferata madeya 8'an da

Dç. Dr. Fikret Başkaya roja 14'ê pûşperê ji Girtîgeha Haymana hate berdan. Wekî ku tê zanîn, Başkaya bi sedema pirtûka xwe ya bi navê "Pradigmanin İflası" (Topavêtina Pradîgmayê) ji aliyê mehkemeyê ve hatibû darizandin û di encamê de jî ji qanûna 3713'yan madeya 8'an, 20 meh heps û 41 milyon û 666 hezar ceza standibû. Fikret Başkaya di 18'ê adara 1994'an de hatibû girtin.

## Heyeta PKD'ê li Îtalyayê

Serokê Heyeta Kargeriyê ya Parlamentoya Kurdistanê ya Li Derve (PKD) Zübeyir Aydar û heyeta parlamentoyê, roja 13'ê pûşperê li Îtalyayê dest bi hevdîtîna û têkiliyan kirin. Aydar û heyetê bi serokê Komîsyona Penaberan yê Îtalyayê û Serokê Komîsyona Karê Derve yê Senatoyê Migone re hevdîtîna kirin. Rayedar û parlementerên italî daxuyandin ku ew dixwazin têkiliyên xwe bikin sistematîk.

## Rojnameyê nû: Roj

Li Stenbolê rojnameyê heftane bi navê "Roj" dest bi weşanê kir. Xwediyê rojnameyê Adıgüzel İncesu û Berpirsiyarê Giştî jî Mehmet Mutlu ye. Di rojnameyê de hin nivîs û beşên kurdî jî hene. Wekî hemû rojnameyên kurdan yê din, hejmara Rojê ya yekemîn jî ji aliyê Dadgeha ewlekariya Dewletê (DGM) ve hate berhevkerin.



Navên 10 kesên ku di xaçepirsa hejmara 29'an de peyva veşarî 'Mahabad' dîtine û kaseta "Şemal" qezenc kirine:

**Sudo Bawer Amed**

Zeycan Atabey Wan

**Ahmet Kaya Bursa**

Bülent Uçaman Amed

**Neşe Çetin Elîh**

Azad Bahadır Stenbol

**Atilla Gökberk Alanya**

Zeynep Zerin Edene

**Hamit Tan İzmir**

Cemil Bağcı Enqere

## Rapor, Rêxistina Efûyê ditirsîne

Polîsan, dest danîn ser dokumanên Nûnerê Maseya Tirkîyeyê yê Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî Helmut Oberdiek (di hefteya borîn de ji Tirkîyeyê hatibû derxistin). Wekî ku tê zanîn Oberdiek, ji bo ku agahiyan der heqê perçiqandina mafên de mirovan berhev bike û raporê amade bike, di 28'ê gulanê de hatibû Tirkîyeyê û li Enqere û Edene yê hin têkilî danibûn. Ji Tirkîyeyê derxistina Nûnerê Efûya Navneteweyî, ji aliyê gelek kes û saziyan ve hatibû protestokirin. Piştî bûyerê, rêxistinê ji bo parastina kesên ku navê wan di raporê de derbas dibin,



**Helmut Oberdiek**

dest bi xebatê kir. Nûnerê rêxistinê yê Maseya Tirkîyeyê Jonathan Sugden bi telefonê ji teşkîlata HADEP'a Edene yê xwest ku dema li wan kesan pêkûti û cerd bike, bila rêxistinê agahdar bikin.

Navenda Nûçeyan

## Cerdevanî li Behra Spî

Di navbera hêzên DARGK'ê û hêzên dewletê de her diçe şer diwartir dibe û seheya xwe jî berfirehtir dike. Ev demeke dirêj e li herêma Behra Spî, li çiyayên Toros, Amanos, Ermenekê gerîla livbaziyan dikin.

Piştî ku gerîlayên ARGK'ê li herêma Behra Spî dest bi livbaziyan kirin, artêşa tirk gelek leşker, tîmên taybet, cebîlxane û hwd. sewqî herêmê kirin. Piştî vê yekê bi biryara Lîjneya Ewlekariya Dewletê (MGK) sîstema cerdevaniyê li herêmê hate bicîhkirin. Li gorî agahiyan ku gihîştin dest me, li Hatayê, li navçeya Hasa, gundên Dedenlî, Sögüt, Karafaklı, Kozanuşağı, Yenyapan û Akbezê 200 sîleh, li Edene yê jî, li navçeyên Sambeyli, Dört Yol û Erzînê 1000 sîleh hatine belavkirin.

Navenda Nûçeyan

## Piştî Erzeromê îcar Elbistan

Gerava birçibûnê ya girtiyên Girtîgeha Elbistanê kete roja 29'an. Li gorî agahiyan, siheta girtiyan her diçe xerabtir dibe û tê gotin ku cerd û pêkûtiyên li ser wan zêdetir dibin.

Ji rayedarên HADEP'a Îskenderunê Hamit Özgüç ku nû ji girtîgehê derketiye, piştî berdana xwe daxuyaniyek da. Özgüç got ku girtiyan ji dozgerê girtîgehê, rayedarên girtîgehê, Wezîriya Dadê û Wezîriya Mafên Mirovan re pêşniyaznameyek şandiye û ji

wan sekinandina cerd û êrîşan xwestine. Di dewama axaftina xwe de jî Özgüç got: "Piştî pêşniyaznameyê ji dêla ku cerd û êrîşên li ser me kêmbibin, hîn zêdetir bûn. Dema em dibirin mehkemeyê, em tazî dikirin û pişt re jî îşkence bi me dikirin. Di hevdîtinan de ji 10 deqîqeya zêdetir destûr nedidan me ku em lêzîmên xwe bibînin. Bi navê lêgerînê, qawîş talan dikirin û girtiyên nû jî ji hevalên wan tecrît dikirin." Navenda nûçeyan



**XAÇEPIRSA BIXELAT (29)**

C	K	E	E				
B	I	Ş	A	F	T	I	N
W	E	Ş	A	N			Î
Q	A	M		L	A	L	
N	Î	Ş	K		A	K	K
R	H		O	L	Î		O
A	B	R	A	H	A	M	L
Y	C	K		N	A	V	E
O		D	D	T		L	E
H		K	O		E	G	E

PEYVA VEŞARÎ →

**XAÇEPIRSA BIXELAT (31)**

Rêber	Nependî Şairekî Kurd (di wêna de)	3	Hidrojen	Notayek	5	Niqte	Paytexta Arnavudê
Çit			Rewşen	Notayek		Doktor	
			7	Navek			
				Lûfik			
Cûkek						Navek	
Zaravayek Kurdî							
					Paşgîrek		Yezdanek ji Misra qedim
					Çajî		
Nîfîrek jehr						Rêxistina Îrlandî	6
Oksîjen						Metod	
	Sewalek		1	Xem, keser			
	Zarokên bêsekin			Şuştin			
Keynî		2	Kar		Gola ku bi awa baranê çêbûye		
Bajarek			Mehele				
				Dînî			8
				Roj, Tav			
Mehek						Rojek	
Îrdîûm							
4			Gula rûbîskivî				

PEYVA VEŞARÎ →

**Xaçepirsa me bixelat e.** Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi rîya pişkê (kura) li 5 kesan tèn belavkirin. Xelata hejmara 31'an; pirtûka **Cengiz Aytmatov "Evîna Cemilê"** ye. Ev pirtûk ji aliyê Weşanxaneya Fîratê ve hatiye çapkirin.

**Jêrenot:** Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

**Xelata Xaçepirsê**

**Cengiz Aytmatov**

Wergêr: Naci Kütlay

**"Evîna Cemilê"** Cengiz Aytmatov



## Li Hondurasê jî şîrîkên şerê qirêjî

Li gorî rapora Komîsyona Mafên Mirovan a Hikûmetê, CIA û hinek rayedarên arjantinî di salên 1980'yî, di şerê qirêjî yê li hemberî gerîlayên çepgir ên Hondurasê de şîrîkatî kirine. Endamê komîsyona mafê mirovan ê hikûmeta Arjantinê Leo Valladares, navê rayedarên arjantinî ku li Hondurasê alîkariya General Gustavo Alvarez Martinez (di sala 1989'an ji aliyê gerîlayan ve hate kuştin) kirine, îlan kir. Vallares got: "Li gorî agahiyên di dest de sala 1981'î Rêvebirê Navarasta Amerîkayê yê CIA'yê Raul Clarson de la Vega hatiye Tegucigalpa'ya Hondurasê û ji bo rêlibergirtina komunîzmê hinek taktîk dane."

## Polîsên alman avêtin ser malên antî-împeryalîstan

Di berbanga 13'ê pûşperê de polîsên alman avêtin ser 50 malên ku li gorî îdiayê tê de endamên Yekîneyên Antî-împeryalîst (AIZ) dimînin. Berdevkê dozgerê federal li ser sedem û encama cerdan tu agahî nedan. AIZ, ev nêzî salakê ye ku li hemberî hin kes û sazîyên "faşîst û şîrîkê împeryalîstan" livbaziyan bombekirinê pêk tîne. Hin kes vê rêxistinê wekî dûmahîka Artêşa Sor a ku di navbera salên 1970 û 1980'yî de li hemberî dewletê şerekî tund dimeşand, bi nav dikin. Wekî tê zanîn polîsên alman li dijî sazîyên kurdan jî gelek caran êrîşên bi vî rengî pêk anîne, hê jî tînin.

## Gelê Swêdê NATO'yê naxwaze

Lêpîrsînên ku li Swêdê çêdibin, nîşan didin ku gelê vî welatê naxwaze bibe endamê NATO'yê û beşdarî peymanê xweparêziyê ya Yekitiya Ewrûpayê bibe. Li gorî encama lêpîrsîneke ku 12'yê mehê di rojnameya Svenska Dagbladet de hate weşandin, ji sedî 58'ê mirov naxwazin Swêd bibe endamê NATO'yê. Dîsa li gorî eynî lêpîrsînê ew naxwazin ku ji aliyê rêxistineke leşkerî ya girêdayî Yekitiya Ewrûpayê ve bîn parastin.

## Germê li Hindistanê nêzî 300 kesî kuştin

Li Hindîstanê tîna germê ku heta 50 dereceyî hilkîşî, bû sedema mirina 278 kesî. Rojnameya New Delhi Sunday roja 11'ê pûşperê da zanîn ku heta niha ji ber germê zêdetirî 278 kesî mirine. Lê hinek ajans dibêjin, "Ji ber ku kesên jî navenda bajêr dûr, nakevin nava qeydan, haya kesî jî wan kesan çênabe. Lewre hejmara kesên ku mirinê zêdetir in." Ajansa The United News of India'yê ew hejmar wekî 291 daxuyand.

## Ji muxalefeta Zelandaya Nû: Kampanyaya li dijî Fransayê

Partiya Ked a Zelandaya Nû li dijî ji nû ve dest-pêkirina ceribandînan nuklîer ên ku Fransa li deryayê başûrê Pasîfik dike, kampanyayekê li dar dixê. Seroka partiya dijber Helen Clark daxuyaniyek ji Serokê Fransayê Jacques Chirac re şand, jê xwest ku ew ceribandînan li Mururoa Atoll çêbin. Wê got ku ewê afîşan daleqînin û eynî mesajê bigihînin balyozxaneyê Fransayê jî. Clarkê got: "Emê bi wan bidin fêmkirin ku dema ew Pasîfikê wekî laboratuara ceribandînan nuklîer bi kar bînin, em nikarin bêdeng û bêbîzav bimînin."

Nûçeyên Derve

# Kurd cezayê mirinê didin tûrîzmê

Rojnameya The Europeanê nivîsek li ser çalakîyên kurdan ên li hemberî tûrîzma Tirkîyeyê weşand. Nivîs li ser navê Richard Wayman di hejmara 9-15'ê pûşperê yê vê rojnameya hefteyî de derket. Nivîs wiha dest pê dike: "Dayikeke kurd, ku zarokê li hembêzê ye, li nav mala xwe ya ku bi destê leşkerên tirk hatiye rûxandin rûniştîye. Li ser afîşê ku ev wêne dixuye, slogana, "Li Tirkîyeyê bêhdaneke delal, werin serdana tiştên me ku dilê mirov dikşîne." Ev dîmen parçeyek ji kampanya Partiya Karkerên Kurdistanê ya li dijî tûrîzmê ye. PKK'ya ku ji sala 1984'an bi vir ve ji bo welatekî serbixwe yê kurdan şer dike, dixwaze bi van kampanyayan hatina Tirkîyeyê ku ji tûrîzmê, bibire."

Li gorî nivîskar ev poster tenê aliyekî xebata PKK'ê ye, di nava kampanyayê de "tehdît" jî cih digirin. Nivîskar dibêje ku çavkaniyên nêzî PKK'ê gotine: "Heke tûrîst guh nedin van



Ji kampanyaya kurdan a li dijî tûrîzma Tirkîyeyê dîmenek

mesajan û herin Tirkîyeyê wê bibin hedefa êrîşan." Nivîs dide zanîn ku sala çûyî li ber Behra Spî bombe teqîne û li Stenbolê jî bi bombeyan 3 kes mirine, gelek jî birîndar bûne.

Pişt re tê gotin ku sala 1994'an 2.5 milyon tûrîst çûne Tirkîyeyê ku nivî wan almanî bûne û wan kesan 4.5 milyar pere li dû xwe hiştine. Nivîs di de zanîn ku aboriya Tirkîyeyê ya qels pir bi dijwarî kare bixebite, heke ev pere ji dest biçin. Di nava nivîsê de tê gotin ku Tirkîye bi hindîkayî

salê 6.5 milyar dolarî li şer xerc dike. Ev pereyên ku li şer diçin, dibin sedema enflasyonê bilind. Nivîs balê dikîşîne ser tiştêkî din, dibêje ku tûrîst jî ber vê enflasyonê diçin Tirkîyeyê. Tê gotin ku tûrîstên îsal wê li gorî sala çûyî ji sedî 32 hindiktir pereyan xerc bikin. Li gorî nivîsê, ji ber vê yekê Tirkîye wekî cihê bêhdanê, di nav îngilîzan de hilkîşîye reza yekemîn. Tê gotin ku li Almaniya, Belçîka û welatên Skandinavyayê hejmara kesên ku diçin Tirkîyeyê jî ber xebatên

kurdan, ji sedî 20-30 kêmkirî bûye.

Gotinên Serokê Enstîtuya Lêkolînên li ser tûrîzmê ya Zanîngeha Belforda Îngilîstanê Desmond Fernandez balê dikîşîne sersariya şîrketên tûrîzmê. Fernandez dibêje: "Şîrketên tûrîzmê bi dîmenên balkêş û xweşik reklaman dikin û dixwazin bi vî awayî mirovan bikişînin Tirkîyeyê. Ew tu agahiyê nadin mirovan. Ev bêberpirsiyariyê mezîne û jiyana mirovan dixê nava xetereyê."

Nûçeyên Derve

## Dudayev: Rûsya dixwaze di dojhê de bişewite

Serokê Çeçenîstanê Dzhokhar Dudayev Heftiya çûyî bi rîya telefonê daxuyaniyek da ajansa Reutersê. Dudayev di daxuyaniya xwe de got: "Rûsya dixwaze di dojhê de bişewite."

Li hemberî pirsê muxabîrê Reutersê, wî got: "Pêngava duyemîn ev e; divê Rûsya di nava dojhê de bişewite. Ê me, xwîna me ya pak heye ku em li ser xaka xwe birîjînin."

Dudayevê ku bi telefonê ji cihekî nediyar xwe gihand Reutersê, got: "Divê dewleta Rûsya bipelişe û kovakeke spî cihê eyloyê biduserî (nîşana Rûsyayê) bigire." Serokê Çeçenîstanê Dudayev daxuyand ku rewşa wan baş e. Wî got: "Heta niha tu car qasî vêgavê ez bi rewşa xwe dilxweş nebûme." Wî got ku piraniya tiştên ku wan dabûn ber xwe kuta bûne û ew li ber gihîştîna armanca xwe ya herî



Hêzên Çeçen ji başûrê welatê ber bi çiya vekişyan.

bilind in.

Dudayev li ser tevdir û amadekariyên xwe tu agahî nedan. Bi tenê got: "Planên me, tiştên ku Xwedê ferman bike ne."

Li aliyê din piştî lihev-xistinên tunde, hêzên çeçen ji hinek navçeyên başûrê wekî Şatoy û Nojay-Yurtê, ber bi çiyayê vekişîn û ew der ketin bin kontrola hêzên rûs. Hêzên çeçen dan zanîn

ku ew bi mebesta parastina ewletiya mirovên sivîl vekişîne.

Li gorî agahiyên ku ajansa Agence France Pressê dan, hêzeke çekdar roja 14'ê pûşperê avêtin ser nehiya Budevovskê ku li başûrê Rûsyayê dikeve. Wan kesan avahiyên dewletê dan ber guleyan û piştî lihev-xistinê ew der dagîrkirin. Bi hatina hêzên rûs jî

derve, şer çend seatan dom kir û ew kes tevî hinek rehîneyan ber bi Çeçenîstanê vekişîn. Di vê bûyerê de ji her du aliyayan gelek kes mirin. Çavkaniyên rûsî şer vanên çeçen wekî berpirsiyarên bûyerê bi nav kirin, lê çeçenan bi awayekî resmî berpirsiyariya xwe diyar nekirin.

Nûçeyên Derve



# FAL



## BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)

Van rojan hûn karê xwe zehf îhmal dikin. Heke hûn îro karê xwe bi rêk û pêk nekin, sibe roj wê gelek karên we bikevin ser hev. Wê çaxê ji bêgavî be jî wê lingê we têkeve soleke teng û hûnê gelek zehmetiyan bikişînin. Ji tava rojê birevin, ne ji kar.



## GA (21 Avrêl - 21 Gulan)

Hûn ji her tiştî zêdetir jî lome û gazinên dost û hevalan direvin. Ji bo we, "Lomeyên dinê jî ezabê gorê xerabtir in." Ji ber ku hûn hez ji îsrafê nakin, hûn ji paşgotiniyan xelas nabin. Hin kes we bi çikûsiyê tawanbar dikin, bila haya we jê hebe.



## CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)

Bêhtengiya we bandorê li karê we dike. Heke dilê we bi xwediyê/a kar naşewite jî, bila bi keda we bişewite. Tê gotin ku ked ji ewlêd şîrîntir e. Di vê gotinê de hinekî nepixandin hebe jî, parçeyek jî rastî tê de ji xwe re cih dibîne.



## KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tirmeh)

Xem qet li we nayê. Dema kul û keser we dixin nava pêlên xwe, hûn tavilê nexweş dikevin. Lê hûn dîsa jî serê xwe di ber xelkê de diêşînin. Hûn çî dikin, bi xwe dikin, ne bi kesî/e din. Lewre dilê xwe nekin hêlîna kul û xeman.



## ŞÊR (24 Tirmeh - 23 Gelawêj)

Hûn ji hîndekariyê hez dikin, lê çî heyf e ku haya we ji prensîba bingehîn a vî karî tune ye. Wekî kalikên me jî gotine, "Hesin bi germî ditewe." Gelo we tu carî di cih û wextê de şî-retek li kesî kiriye? Heke bersiva we, "Na" be, 'loma' li kesî nekin.



## SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)

Mirovên berê gotine, "Ewê ku bipirse, ew ditirse." Tê ditin ku hûn jî ne mirovên pir wêrek in. Lê hûn ji kesî tiştekî napirsîn, ji ber ku qet kêfa we ji axaftinê re nayê. Divê hûn fêhm bikin ku newêrekiya we ne tiştekî xwezayî ye.



## MÊZÎN (24 Rezber - 23 Kewçêr)

Gelo hûn xwe ji kê vedişêrin? Wekî pêşiyên me jî gotine, "Berhema darê, xemla darê ye." Ê we jî heke hûnê bejin û bala xwe nîşanî mirovan nedin, hûnê çawa ji xwe re dost û hevalan bibînin û jî serêşa tenêtiyê xwe xelas bikin?



## DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)

Hûn bi xwe bawer in. Divê hûn bizanibin ku mirov bi tayê tenê nikare tiştekî bike. We alîkariya hevalan divê. "Dest li ser destan, hetanî ezmanê heftan." gotine pêşiyên me. Ji xwe re sarincekê bikirin û bila haya we ji ava ku hûn vedixwin hebe.



## KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Hûn wekî mirovên şerûd tèn nasîn. Ev jî ji ber ziman-dirêjîya we ye. Heke mirov bi pirêzeya we bihesin, êdî hûn nikarin kesî bixapînin. Ji we tê xwestin ku hûn kêmbibêjin, zêde bikin. Ev jî bo ewletîya we pêwîst e.



## KARİK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)

Hûn bi raman û tevgerînen xwe bala mirovan dikişînin ser xwe. Lê hûn guh nadin xebata ji bo başkirina jiyânê, bi xeyala bihuştê dijîn. Mîstîzm pir tesîrê li we dike, ji bîr nekin ku bihuşt li ser erdê ye, ne li ezmanan e.



## DEWLIK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)

Hûn xwediyê soza xwe ne. Piştî ku we gotinek kir, êdî serê we biçê jî, hûn wê danaqurtînin. Li gorî hin kesan hûn qet ji tevgerê hez nakin. Ew ji bo ku we bidin nasîn dibêjin, "Wekî ava golê ye." Wan kesan şermezar bikin û herin lotikxaneyê.



## MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)

Hûn hûr û kûr li derdora xwe dinêrin. Awirên we dilê mirov qul dikin. Heke hûn wiha nav û deng bidin, êdî îmkân namîne ku hûn hin planên xwe pêk bînin. Ji deynan netirsîn, lê dema ji we deyn hate xwestin, xwe nexeyidînin.

# Şifêrtiya paytonvan

Di sala 1972'yan de gajrajek taksîyan li Agirî (Qerekosê) vebûbû. Du-sê taksî lê dişixulîn. Şofêr nivro, taksîya xwe danîbû gerajê, mişte li ser hiştîbû û çûbû malê raketîbû. Ji bilî wê tu taksîyên din li gerajê nîn bûn. Axayek bi lez û bez tê gerajê, ji yê sîmsar re dibêje: "Zû bangî şofêr bike, karê minî pir ecele li gund heye." Yê sîmsar dibêje: "Axayê min, wele erê taksî heye lê nîn e. Taksîya xwe danîye gerajê mişte jî li ser e, lê ez nizanîm bê bi ku ve cehe-miye." Axa dibêje: "Here wî ji malê, werîne." Sîmsar dibêje: "Ez mala wî nas nakim, nizanîm bê li kîjan taxê ye." Gengeşeyek di navbera axê û sîmsar de çêdibe. Di wê navê de, yekî paytonvan di wir re derbas dibe û li wan radiweste. Ji axê re dibêje: "Axayê min te xêr e?" Axe: "Ezê biçûma heta gund, îşê min heye" dibêje.

Paytonvan dibêje: "Axayê min ez û paytona xwe di emrê te de amade ne, de siwar be ku ez te bibime gund." Axa "Karê min zehf bi lez û bez e. Divê ku ez bi taksîyê biçim. Bi paytonê hel nabe. Ma tu şofêrê nas nakî ku tu ji me re bînî?" Paytonvan: "Lê ku hûn ji min re taksîyê bişixulînin, bi izna Yezdan, ezê bi kar bînin û axayê xwe bibime gund, ma ne dîreksiyon e, nola rişma hespên ber paytonê ye." Yê sîmsar mişte li kontaxê dixê, taksîyê dişixulîne, yê paytonvan dikeve ser dîreksiyonê, axa li kêleka wî rûdine, di vitêza duduyan de pê dide gazê û berê xwe didin gund. Nêzî gund dibin, ji nû ve hişê yê paytonvan tê serê wî ku nikare taksîyê rawestîne. Ger raweste, dîsa nikare wê bixebitîne. Ji axa re dibêje: "Ez xulam, wele ez nikarim taksîyê rawestînim. Meydana gund fireh e, ez dê

taksîyê li ve wergerînim, te jî bi xwe re vegeerînim bajêr." Axa dibêje: "Eman zeman..." Paytonvan guh nadê. Axa dibêje: "Îşê min pir ferz e, divê ez li gund peya bibim." Paytonvan: "Maddem îşê te çendî pir e, nexwe xwe ji taksîyê biavêje, tu çareyeke din li cem min nîn e." Axa fêhm dike ku wê dîsa vegere bajêr. Dibêje: "Bavo, belê te li te keve, de hêdî bajo ku ez xwe jê bavêjem. Li rasta gund taksîyê hêdî dike, axa deriyê wê vedike û xwe jê diavêje, du-sê teqle li ser hev diqulibe. Kincên nû gişt dibin toz û herf. Radibe xwe dadikiweşîne. Paytonvan li meydana gund siwareyê vedigerîne, tê di ber axê re derbas dibe û dibêje, "ez xulam ma tu selamet î?" axa hina xwe ji tozê dadîwişand bêhna wî teng e, û dibêje: "De here, seyê kurê se, ez selamet im." Berhevkar: Î. OMERÎ

# Memoyê şivan û bijîşkî

Li Agiriyê, zivistanan berf pir dikeve, riyên gundan bi berfê dixetin, çûn û hatin dijwar dibê. Gamêşên axê li perê gundekî di çewlikê de bûn û Memoyê gavan jî di nav wan de bû. Çelê zivistanê, berf li erdê, sar û seqem bû. Du sê gamêş nexweş dikevin. Memo agahî dide axê li bajarê Agirî. Axe baytarekî bi xwe re dibe û diçin gund. Baytar gamêşan derzî dike û ji Memoyê gavan re dibêje: "Memo, her gav ez nikarim bi te re werim, zivistan e, seqem e, hatina gund zehmet û dijwar e. Aha ji te re şîrinqa 50 cc û çend şûşe Ter-

ramycin, her yek 50 santîm e, ger gamêş nexweş ketin, her yekî 50 cc Terramycin li hêta wan bide. Memo dibêje: "Ez li ber ketim û fêrî vî karî bûm." Rojekê yekî gundî nexweş dikeve, di wê rewşê de birina wî mirovî ya bajêr ji bo bijîşk, gelek dijwar bû. Di wê gavê de Memoyê gavan tê bîra wan. Xwediyê nexweş diçin ba Memoyê gavan ji bo ku alîkariyê bi nexweş re bike jê lava dikin. "Ji dermanekî, ji derziyekê, em di bextê te de, tu di bextê xwedê de." Memo dibêje: "Li herême kesek mîna min nojdar nîn

e. Bijîşkê mezin ez fêrî nojdariyê kirime. Ez dê derziyekê li hêta wî bidim, rabûna wî yek û yek e." Memo diçe ser nexweş, dinihêre ku laşê wî germ e, di tayê de ye. 50 cc terramycin dikişîne şîrinqê û li hêta nexweş dide. Ango di pîvana gamêşekê de derman berdide laşê nexweş. Nexweş ji hiş dikeve, sê roja bêhiş dimîne, dikeve sekiratê. Roja çaran bi ser hişê xwe ve tê, çavên xwe vedike. Li gorî agahiyên ku derdora wî, didin ta mirinê ew mirov nema nexweş dikeve. Î.OMERÎ

### Amîn ya Rebbilalemîn!

Rojekê mirovekî gundî diçe bajêr, karê xwe diqedîne û diçe mizgeftê. Kera xwe li ber deriyê mizgeftê bi dara hejîrê ve girêdide û diçe hundir, nimêj dike. Piştî nimêjê derdikeve derve dinihêre kera wî ne li ber derî ye.

Bi lez pêlavên xwe li piyên xwe dike. Mêze dike çend mirov li ber deriyê mizgeftê rûniştî ne, ber bi wan diçe û wiha dibêje: "Ey cemaatî musulmîn, şu eşaciri enacire qeyd û bend eyledîgim himar, qeyd û bendlerinden xelas olup firara yüz tutmuştur, nazari aliniz oldu mu?" (Yanî, gelî mislimanan, ew kera min a ku bi vê dara hejîrê ve girêdayîbû, hefsarê xwe qetandî ye û reviya ye, gelo we ditiye?) Gundî dibêjin qey dua dike, tev destên xwe berjor dikin û bi hev re dibêjin: "Amîn ya Rebbilalemîn."

T. MURAT BİLGİN/AMED

### Min telebetî xelas kiriye

Di salên berî 80'yî de ji ber ku şoreşgerî ji nav xwendekaran dest pê kir, ji şoreşgeran re jî telebe dihat gotin. Di wan salan de mamosteyekî me diçe gundekî. Gundî tev tèn xêrhatina wî. Mirovekî kal jî mamosteyê me re dibêje: - Mamoste, tu jî ne telebe yî?

Mamoste dibêje: - Na apê min, min telebetî xelas kiriye!

Gundî tev bi nêrîneke din li mamoste dinihêrin û bipaş de vedikişin. Mamoste li rewşa wan dinihêre, ew jî şaş dimîne ku ka çiyê xerab ji wan re gotiye. Heta ku li xwe hay dibe, ji wan re dibêje:

- Heyra min dibistan kuta kirin û ez bûm mamoste. Min di vê wateyê de got, min telebetî xelas kiriye. Ew telebetiya ku hûn dibêjin şoreşgerî ye. Ew tu car xelas nabe.

M. BEDRAN BÊNAV



# Heyîna mîletê bindest: Ol û ziman

Ax û warê kurdan roj bi roj digihîşt dagirkerên tirk, ereb û faris. Ol jî kirin hevsar xistin serê kurdan û ew bi qesrên bihuştê hatin xapandin. Ew bûne xwedanê dewlemend yên bajar, birc û kelatên Kurdistanê. Kurdên reben çeka olî winda kiribûn. Ji ber ku ew û efendiyên serdest, êdî olek bûn. Serê azadîxwaz û welatparêzên kurdan êdî bi çeka olî dihate firandin. Birayên kurdan yên olî, bûbûn dijminê mal û ganê (can) wan.

Eladed Bedirxan Begê nazdar di jîna neteweyî de girîngiya olî bi van peyvên ve tîne ziman:

"Mîletên bindest heyîna xwe jî serdestan

bi du tiştan, bi du qewetan, bi du çekan

diparêzin. Ol yek, ziman dudo. Lê heke

ola mîletê serdest û bindest yek be

hingî çekek bi tenê ye û bend tenê ziman e."

(Kovara Deng -hejmar 31)

Piştî berxwedanên 300 salî kurdan, ola îslamê bi darê zorê pejirandin. Beriya hingê gişt zerdeştî bûn. Çiqas ne baş be jî tu kes jî nava dilê xwe dest ji bawerîya bav û kalên xwe yên olî bernade. Xasma ola Zerdest ya ber aqil û kitêba wî ya pîroz Awestayê.


Serbazên îslamê Xalidê



Saîdî Nûrsî

kurê Welîd, Ebdullahê kurê Umer, Ûtba, Îyadê kurê Xarem, Waliyê emewîyan yê "zalim" Haccac û gelekên din ji Şehrêsorê heta bête deşta Heranê, çiqas xwîna kurdan ri-jandine di nav rûpelên dîrokê de xuya ye.

Lê kurd piştî belavbûna dewleta Medya bûbûn berevanê xaka xwe. Bi zorê ew diparastin. Çavê wan ne li êrîş û talanên cîranên wan bû. Piraniya wan, bi dijminahiya hevûdu re mijûl bûn. Mejiyê wan paqij, dilê wan bêqirêj bû. Bi wî awayî ola îslamê jî bêberjewendî dane piştî xwe û ji bo cîhadê li pêşiya ereb, faris û tirkan meşîyan û xwe dane kuştin. Hin xelîfeyên emewî û ebasîyan ew wekî mertalekê di destê xwe de girtin. Ew nêzikî xwe dîtin, heta carinan xizmaniyên ramyarî jî



Hikmet Çetin

bi wan re kirin. Diya xelîfê emewîyanê dawiyê Merwan, keça Mîr Ehmedê Cizîrî bû. Hin xelîfeyên ebasîyan jî xizmanî bi kurdan re kirin. Sekinandina şerê xaçperesta bûbû karê Selaheddîne Eyûbî. Tevkujiyên ereb, faris û tirkan ku li kurd û Kurdistanê didomandin, qet nedihatîn bîra wî. Çavên wî ew ereb, faris û tirkan ku bi sedan salî Kurdistan talan dikirin, nedidîtin. Dema agir li ser piştî mîrekên kurdan dihate hilkirin, armanca wî jî bûbû parastina Qutsê, Qahirê, Mekke û Medîne. Roja wî bi pêsîra Rîşardê Dilşer digirt, turkmen û selçûkiyan jî xwîna kurdan vedixwar. Welatê wan jî di bin pêyên hespên wan de dihate perçiqandin. Agir ber bûbû mala kurdan, lê kurdan jî agirê berbûyî mala îslamê vedimirandin. Yê ku êrîşên bîzanîsiyan didan sekinandin û di meydana şer de Kral Basîlûsê II. dikuştin jî Ehmed El Dehakê kurd bû. Gotîneke kurdan ya li ser xulamtiya biyaniyan heye. Dibêjin, "Filankes golikê sor e, diçe cotê xelkê lê naçe yê xudanê xwe." Bi rastî jî hem Ebul Muslumê Xoresanî, hem jî Selaheddîne Eyûbî û gelek serdarên kurdan yên din ji paletiya biyaniyan re golikên sor bûn. Her wekî golikên îro Hikmet Çetin, Kamuran İnan, Necmeddin Cevherî û hinekên din.

Ax û warê kurdan roj bi roj digihîşt dagirkerên tirk, ereb û faris. Ol jî kirin hevsar xistin serê kurdan û bi qesrên bihuştê ve hatin xapandin. Ew bûne xwedanê dewlemend yên bajar, birc û kelatên Kurdistanê. Kurdên reben çeka olî winda kiribûn. Ji ber ku ew û efendiyên serdest, êdî olek bûn. Serê azadîxwaz û welatparêzên kurdan êdî bi çeka olî

dihate firandin. Birayên kurdan yên olî, bûbûn dijminê mal û ganê (can) wan. Hemû mafpirsîn û serhildanên kurdan wekî kiriyareke li dijî ol û xelîfê îslamê, dihate hesabandin. Her dem kurdên bindest neheq, lê ew xwînswarên dagirker jî xwedî heq bûn. Ew dibûn şehîd, xazî û ehlê bihuştê, kurd jî bêmanî, dijmine xelîfê îslamê û mêvanên cehe-memê bûn.

Dema li kêleka wan diketin şeran, kurd birayên wan yên olî û mucahid bûn. Lê dema li dijî êrîş û talanên wan disekî-nîn, berevarî û berxwedanî li xwe dikirin, wê gavê jî dibûn "yezîd, qewmê şeytanî." Waliyê osmaniyan yê Wanê Melik Ehmed Paşa, di sala 1655'an de bi bêbextî û bêsedem, bi 70 hezar leşker û kurdên xwefiroş ve çûn ser Mîrê Bilîsê Ebdal Xan Begê. Beriya êrîşê li kêleka bajarê Deşta Rehwayê piştî du rukhet nimêj û duaxwestinê ev gotîbû: "Gelî xaziyan! Hûn hemû bizanî û agahdar bin! Cenga îro mîna ya Kerbelayê ye; ji ber ku ew canên neyar yên ber singên we, yezîdî ne." Bi vê dirûşmê ve leşkerên xwe har û serxweş kirin û bajar da talankirin û kambaxkirin.

Di 1831'ê de serhildana Mehemed Begê Rewandîzî çawa di nav gelê kurd de reha xwe avêt, kedxwaran xwe dîsa bi çeka olî parastin. Hin şêx û meleyên kirêdar, di mizgeftan de bi vê weazê kurdên bindest xapandin. "Di ola îslamê de li-hemberrabûna xelîfê, wekî li-hemberiya Xwedê û pexember tê hesabandin. Li gel leşkerên xelîfê şerkirin jî bêolî bû."

Ev mînak hindik nîn in ku bi nivîsînê xelas bibin. Bi kurtî di dîroka li berxwedanên kurdan de, ola îslamê her dem di destê ereb, faris û tirkan de,



Kamran İnan

bû şûrê zulmê, zordariyê, qirkirin û serfirandinê. Ji bo nîjadê Ebû Muslum û Selaheddîn jî bû lixiv (gem) qeyd (pranga) û zincîra koletiyê.

Qirnê 20'an tê, sedsala hişyarî û rizgariya neteweyên di bin nîrê metingehkaran de. Li deran neteweyîtiyê, pêşiya ol girtin û gelan dewletên xwe bi wî awayî saz kirin û bi pêş ve birin. Oldarên metingehan pêşiyê dibêjin: "Em ereb in, faris in û tirk in û dû re em musulman in." Lê di vê pêvajoyê de jî oldarên kurd berevajî çûn. Beddîuzeman Seîdê Nûrsî dest ji doza neteweyî berda û bi navê Nûrcîtiyê terîqateke nû çêkir. 72 mezhep û terîqatên îslamê hindik dîtin û wî jî yek lê zêde kir û hejmarawan kir 73. Wî jî qendî birayên xwe yî olî yên ku 1400 sala karê wan kurdkuştin bû, bi vî awayî razî kirin.

Sedamê ku xwe seyyid û neviyê pexember dihesibîne, sala 1988'an êrîşa ku bir Kurdistanê Başûr bi navê Ayeteke Quranê (ayeta Enfal) kir. Sê roj piştî tevkujiya Helepçeyê, dewletên îslamê li Kuweytê civînek çêkirin. Serok û rêberên musulman yên beşdarî wê kombûnê bûn, hemûya qatîlê Tirkîrî pîroz kirin û kesekî jî wan behsa biratiya kurdan jî nekirin.

Temaşê bikin, vê xerîbiya ku bi çend salên şûn de li devera Amed û Êlihê çêdibe. Dê tu bêjî qey hûr şekirin û zirav ristina olê îslamê bûye karê zarokên kurdan. Li ser vê bindestîya hezar salan, xîzanî belengazî û bişaftin û birandinê, dasên birakujiyê, careke din di destê wan de ye. Ax dîrok! Tu ji bo gelê kurd çiqas neynikeke (gotiya ronahiyê) bènirx î?..

Î. CÜLEMÊRGÎ



METİN AKDAĞ  
(Ceng)

Sond bi erş û asîman  
Sond bi çiya û zindan  
Rojek baran, rojek wêran  
Em ketin çiyân  
Jînek hebû, jîn  
Çîl dida ku bijî  
Wext û dem ne kifş bû  
Şev û tarî bû  
Sar û seqem bû  
Çîrûskêk ji revazên  
ber bi jêr bû  
Kete gundan, bajaran  
û metropolan

Hevalê Ceng  
(Metin Akdağ)  
şehîdketina te bû kulmekê  
û li nav çavên  
xwînswaran ket.  
Em tu car te ji bîr nakin.

Li ser navê  
malbata wî  
Xarziyên wî Bêrîvan,  
Rojda, Perfîn û xwişka  
wî û zavayê wî



Lêkolînerê çand û zimanê kurdî Gürdal Aksoy li ser kêmasiyên ku di warê çand

# Di nivîsandina dîroka kurdî de zêde r

*Di van mehên paşî de li ser "romana kurdî" gelek gotûbêj hatine kirin. Bi rastî jî romana kurdî zehf girîng e. Lê dîroka kurdî jê girîngtir e. Divê pêşî "dîroka kurdî" ango "dîroka kurdan" bête nivîsandin. Dema ku kurd dîroka xwe binivîsin, wê çaxê wê bikarin romana xwe, şanoya xwe, hunera xwe û hemû tiştên din jî binivîsin. Lê neteweya ku nikaribe dîroka xwe binivîse, nikare tu tiştên din jî binivîse. Tiştên ku bêne nivîsîn jî, wê xav bimînin. Neteweyeke din wê lihêfêki biavêje ser hemû tiştan û veşêre.*

**B**irêz Aksoy, te û kurdolojiyê çawa hevûdin nas kir?

- Li Fakulteya Hiqûqê profesorekî jî me amadekirina tezekî xwestibû. Min jî bi navê "Di Riya Azadiyê de Mirov" karek amade kir. Ev karê min ê yekemîn bû. Pişt re bi hevvalêkî di girtîgehê de têkiliyên min hebûn. Me name ji bo hev dişandin. Di pirtûka birayê min ê mezin Bilal Aksoy de çend dîtin li ser Newrozê hebûn. Li ser vê mijarê di nameyan de me gotûbêj dikir. Bi vê wesitêyê min dest avêt lêkolînen li ser mîtolojiya Newrozê. Min dixwest ku ez bizanibim Kawa kî ye? Gelo di dîrokê de bi rastî jî heye an mirovekî mîtolojîk e? Bi vê pirsê ez ketim nava kurdolojiyê.

Heta niha di rojname û kovaran de çend nivîsên te derketin û mijarên van nivîsan piranî li ser çi ne?

- Heta niha nêzîkî 10 lêkolînen min hatin weşandin. Hejmara nivîsê din yên ku di rojnameyan de hatin weşandin, nayê bîra min. Ev nivîs piranî li ser antropolojî, dîrok, etimolojî, mîtolojî, hinek jî li ser kurdolojiyê ne.

Ez dibînim ku mijara we ya bingehîn ne "dîrok" e. Lê nivîsên we bi piranî li ser dî-

rokê ne. Wekî ku ez dibînim tu dixwazî li ser dîrokê dom jî bikî, gelo çima dîrok û ev meroqa te ji ku derê tê?

-Ez li ser bingeha zehf tiştan difikirim, bingeha hin tiştan meraq dikim. Bi mînak; bingeha eşqê, ya mirov û ya hinek tiştên din. Ev mijar hem bi dîrokê ve hem jî bi antropolojiya civakî ve girêdayî ne. Lê ev herdu şaxên zanistiyê nêzîkî hev in. Bi vî şêklî meroqa min dest pê kir. Piçêkî jî ev yek bi îdeolojiya min ve girêdayî ye. Lewre gotineke Marx jî heye ku dibêje: "Em şaxekî zanistiyê dinasin ew jî dîrok e." Ya din jî di riya çêbûna neteweyekê de dîrok derdikeve holê. Ji bo vê yekê jî ez dixwazim tiştêkî nîşanî we bidim. Di van meh û rojên paşî de li ser "romana kurdî" gelek gotûbêj hatine kirin. Bi rastî jî romana kurdî zehf girîng e. Lê dîroka kurdî jê girîngtir e. Divê pêşî "dîroka kurdî" anku "dîroka kurdan" bête nivîsandin. Dema ku kurd dîroka xwe binivîsin, wê çaxê wê bikarin romana xwe, şanoya xwe, hunera xwe û hemû tiştên din jî binivîsin. Lê neteweyê ku nikaribe dîroka xwe binivîse, nikare tu tiştên din jî binivîse. Tiştên k u

bêne nivîsîn jî, wê xav bimînin. Neteweyeke din wê lihêfêki biavêje ser hemû tiştan û veşêre.

Li pêşberî dîroka kurdan, dîwarekî gelek stûr heye. Li gorî we ev dîwar wê çawa bête herifandin û dîroka kurdî bête nivîsandin?

- Divê ez vê yekê itiraf bikim ku min bi uslûbekê dest neavête van lêkolînan. Lê di rojên paşî de, di alema zanistiyê de jî, gelek dîtinên cihêreng derketine holê. Li gorî van dîtinên nû, zanistî û karê zanistiyê bi xwe piçêkî serberedayî ne yanî piçêkî anarşîst in. Tu bi kîjan uslûbê li dîrokê binêrî, tu yê rastiyê bi wî şêklî bibînî. An jî tu yê nekarî peyda bikî. Ez bi xwe çavkaniyên materyalîzma dîrokî jî bo dîrokê bes dibînim. Lê di gel vê yekê divê haya te ji rêbazên (metod) din jî hebe. Dema mirov li nivîsa dîroka kurdî dinêre, dibîne ku zêde romantîzm di nav wê nivîsê de heye. Bi rastî di nivîsa dîroka gelek neteweyan de jî ev tewr heye.

Ango tu dixwazî bêjî ku bi çavikî neteweperweriyê tê nivîsîn?

- Nîjadperestî li aliyeke, lê neteweperwerî piçêkî lazim e. Jixwe, neteweyên bindest nikarin bibin nîjadperest, lê ev heye ku, di nivîsa dîroka

kurdî de neteweyî kurdan dixin nava navenda dîroka dinyayê. Ev yek ne tewreke zanistî ye. Tewreke romantîk e. He-ye ku hinek kes rexneyan li vê fikrê bigirin, lê rastî ev e.

Di nivîsandina dîrokê de tiştê herî girîng çavkanî ne. Gelo tu çawa dikarî xwe bigihîni çavkaniyan ango bingeha pirsan?.. Lewre nivîsa waqîyan bingeha dîrokî ye, an na?..

- Waqîye bixwe jî ji aliyê dîrokvanan ve tene çêkin. Dîrokvana tiştêkî hildigire, mirovekî an mijarekê û dinivîse. Ew tişt dibe mijareke dîrokê ango dibe dîrokî. Gerçî dîrok ne tenê ev çend e, lê vê yekê ez dikarim bibêjim ku di dema lêkolînan de gelek zehmetî derdikevin pêşîya min. Ez gelek caran nikarim xwe bigihînim çavkaniyên girîng.

Ango di vê mijarê de çavkanî hene?..

- Gelek hindik! Bi taybetî çavkaniyên rasterast li ser kurdan gelek hindik in. Jixwe heta îro hinek akademîsyenên rojavayî li ser dîroka kurdan hinek tişt nivîsîne. Wan jî gelek caran bi çavên neteweyên xwe dîrok nivîsîne. Ez piranî li ser dîroka "qirna pêşîn" radiwes-

tim. Ji ber vê yekê jî ez pirtûkên li ser sumerolojiyê, asurolojiyê vedikolim. Tiştên ku min di van lêkolînen xwe de derxistin holê, ez ji nû ve şirove dikim.

Di pirtûka we ya bi navê "Zimanê Kurdî û Efsaneyên wê" (Kürt Dili ve Söylenceleri) de tiştên ku tu gihîştîyê û te derxist holê, tu dikarî ji me re bi kurtasî bibêjî?

- Tiştê ku min dît, ev e ku mîtolojiya Newrozê gelek fireh û mezintir e. Ev qîmeta gelek neteweya ye. Bi mînak 21'ê adarê cejna sala nû ya Sumer, Babil, Hitit heta li ewrûpayê jî di qirnên 17-18'an de destpêka sala nû ji 21'ê adarê avêtine 1'ê rêbendanê. Tiştêkî din jî heye; zehfên gelên dinyayê xwedî "hesinkarekî mîtolojîk" in. Bi navê Wayland (hesinkarekî germanan) heye. Hesinkarê grekan Hephaistos heye. Govannon yê kelta ye.

Di mîtolojiya Newrozê ya ku mirovê jî rêzê dizane de; bi navê Dehaqê zalim qralek heye û hesinkar Kawa li ber wî qralî radibe. Gelê kurd jî ji wê derê tê. Ji bo vê yekê tu dikarî çi bêjî? Ango rastiya vê mîtolojiyê çi ye, çi qas e?..

- Ev yek di Şerefnamê de jî derbas dibe. Ango gelê kurd ev mirovên ji ber zilma Dehaq reviyên çiya, ji wan tî. Lê ev tiştêkî efsanewî ye. Di dîrokê de bi navê Dehaq qral hîç tunin. Di destpêkê de ango di mîtolojiyê de ev navê ejderhayekî ye. Bi navê Azî Dahaka ejderhayek xwedanê sê serî û şeş çavan e. Neqencî û tariyê temsîl dike. Ev digihîje heta mîtoliya hindê. Dema ku gelên Arî diçin Hindistanê, rastî gelek navçeyan dibin û ev gel goştê xav ê mirovan dixwe. Navê vî gelî Daha ye. Baweriya vî gelî bi cinêkî heye, bi navê Ahî, gelek

caran di şêklê maran de tê nasîn. Ji vê jî Ahî-Daha-



Gürdal Aksoy

Hieros Games  
**TANRI BABA "UZERINE NOTLAR**



Qapaxên pirtûkên Gürdal Aks oy




ka kurdî de tîn kirin sekînî:

# antîzm heye

## GÜRDAL AKSOY KÎ YE?

Di sala 1968'an de li bajarê Bîngolê hatiye dinê. Dibistana pêşîn û ya navîn li Elezîzê xwendiyê. Lîse jî li Antalya û Enqereyê qedandiyê. Pişt re di zanîngeha Enqereyê Fakulteya Hîqûqê de dest bi xwendinê kiriye. Hê jî di vê fakulteyê de, xwendina xwe didomîne. Di sala 1988'an de hatiye girtin. Nêzîkî salekê di girtîgehê de maye. Aksoy heta niha bi navê "Kürt Dili ve Söylenceleri" û "Tanrı Baba Üzerine Notlar" du pirtûk nivîsandine. Nivîsên wî di Rojnameya "Özgür Gündem", "Özgür Ülke" û "Yeni Politika" yê de hatine weşandin. Di çend kovarên din de jî piranî li ser dîrokê nivîsên wî hatine weşandin.



ka, Azî-Dahaka tê. Di mîtolojiya hindê de di navbera Xwedê Indra û Ahî de keftûleşt heye. Ev keftûleşt di Îrana kevin de jî tê xuyan (dîtin). Heta ev yek li Babilê jî heye. Li Îrana kevin bi navê Thraetaona Xwedêyek heye û bi Azî-Dahak re şer dike. Bingeha Ferîdun jî digihe vî Xwedâyî bingeha van jî, ji mîtolojiya Hindê tê. Di mîtolojiya hindê de, roja ku Xwedê ejderha li çiyayekî heps dike an jî dikuje, piranî ew roj sersal e ango cejna sersalê ye.

Ev dem li Hindistanê 21'ê pûşperê (hezîran). Di vê mehê de li Hindistanê baran ji hemû mehan zêdetir dibare. Li Îrana kevin ev dem 21'ê adarê ye. Li Babilê jî, dema xweda Marduk ejderha Tiamat dikuje dîsa 21'ê adarê ye. Li ba Hîttîtan jî di 21'ê adarê de Xwedâyê ezman ejderha illuanka dikuje. Ev dîrok hemû jî destpêka sala nû ne.

Pişt re ev mîtolojî hêdî hêdî guherîne. Cihê xwedayan, mirovan girtine. Gelekî pişt re jî ev mîtolojî ketiye nava jîna civakî. Di vê keftûleştê de, rola hesinkar gelek mezîn e. Bi mînak di yewna kevin de Xwedê Zeus dema, bi Typhoon re dikeve şer, Hephaîstosê hesinkar alîkariya Zeus dike. Dema di mîtolojiya hindê de, Xwedê Indra bi Ahî re dikeve şer, Tvaştr

rê zenaatkar alîkariya wî dike. Di mîtolojiya kurdan de jî, Xwedê ji nav keftûleştê derketiye û şer di navbera Dehaq û Kawa de derbas dibe. Di civakên kevin de baweriyek heye ku rima Xwedê ev hesinkar çêdikin. Ji bo vê yekê ev nav û ev rol dane van kesan. Lê tiştêkî cihêreng heye, di hemû mîtolojiyên dinyayê de, hesinkar, gelek kirêt an jî seqet tîn nişandan. Li gorî lêkolînekê di nav hemû mîtolojiyan de Hesinkar Kawa xwedî kesayetiyeke gelek bilind e. Li gorî min jî wisa ye, yanî şoreşger e lê li gorî min di şoreşgeriya Kawa de piçekî rola rewşenbîrên kurd jî heye.

**Gelo lêkolînên ku we li ser bingeha zimanê kurdî kirin, gihîştin ku derê?..**

- Di van demên paşî de, êdî gelek kes dibêjin ku welatê bingehîn yê civakên Hînd-Ewrûpa Kurdistan e. Ev nêrînek xwedî qewet e. Lêkolînerê Swêdî Colin Renfrew û lêkolînerê Gurcî profesor Thomas Gamkrelidze jî hevûdin bexêber gihîştine vê encamê. Ango wekî tê zanîn, bingeha kurdî ji zimanên Hind-Ewrûpa tê. Digel vê yekê ez dixwazim tiştêkî din bibêjim.

Tevî zimanan li cihekî digihin hev. Tê gotin ku bingeha hemû zimanan yek ziman e. Lêkolînên li

ser vê yekê hene. Navê vî zimanî jî "Zimanê Nostratik" e. Profesorekê biyanî di kovareke tirkî de, li serê vê meseleyê nivîsbû. Di nivîsa xwe de bingeha zimanê Nostratik, Mezopotamya babar, an ku rojhilata Anadolê nişan dabû. Di nivîsê de wekî hûn bikaribin texmîn bikin navê Kurdistanê eşkere nehatiye nivîsîn. Bi ronahiya van dîtinên li jor, em dikarin bibêjin ku kurdî zimanekî kevin e. Lewre kurdan qet dev ji welatê xwe ber nedane û neçûne cihekî din. Lê têkilî û wekhevîyên zimanên kurdî û zimanên din bi temamî hêj nehatine kişîkirin. Lê di pirtûka xwe de min

nêzîkiya kurdî û sumeriyê nişan da. Hinek nêzikahî bi zimanê hîttîtan re jî heye. Lê, ne mûmkûn e, ji ber van nêzîkiyan ku mirov bibêje sumerî an jî hîttî an jî hurî kurd bûn. Lewre heye ku zimanên gelên di herêmekî de jiyabin di bin bandora hev de mabin.

**Di van demên paşî de qet xebateke we heye? Ku hebe li ser kîjan mijarê ye û wê kengê bigihîje xwendevanên we?**

- Min di destpêkê de jî qala xebata xwe ya paşî kiribû. Ev xebat niha li ber weşanê ye. Bi navê "Di Riya Azadiyê de Mirov" di demeke kurt de wê pêşkêşî xwendevanan bibe. Lê xebateke mu-

hîmtir jî ev e, eger ez xwe bigihînim çavkaniyên li Ewrûpayê min dil heye, bi navê "Welatê Xwedêyan, Kurdistan" pirtûkekê binivîsim. Heta niha li ser vê mijarê wekî gotar hinek nivîsên min jî derketine. Ez dixwazim têtîkiliya Xwedâyê ku civakên semîtîk kirin wek "Yek Xweda" û têtîkiliyên kesayetiyan mîtolojîk wekî Adem û Hawa, Nûh, Îbrahîm û Hizir bi Kurdistanê re çi ne bidim nişan.

Lewre li gorî fikra min gelek ferqa Xwedâyê ku civakên semîtîk kirin wek "Yek Xweda" ji Xwedâyên Hînd-Ewrûpî kevin yê ezmanî tune. Gelek taybetiyên vî Xwe-

dayê yekane dişibin "Xwedâyê ezman". Hinek taybetiyên vî Xwedâyî em incax dikarin ji nav axa Kurdistanê derxin ber çavan.

**Di dawîya vê sohbetê de, tu dixwazî mesajekê ji bo xwendevanên rojnameyêke xwerû bi kurdî rê bikî?..**

- Ez ji xwendevanan dixwazim ku tenê rojnameyê nexwînin, lê dest biavêjin nivîsadinê jî. Lewre, çanda me ya nivîsandinê çêdibe. Divê xort, law, qîz, hewl bidin ji bo pêşveçûnê.

HEVPEYVÎN:  
JÊHAT SERHENG



# Şer li çiyayê Munzur dijwar e

Di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de vê heftiyê şer bi taybetî li Dersimê gur bû. Gerîlayan cerdî ser bajêr û navçeyan kirin û bi êriş û kemînan gelek zayiat dane hêzên dewletê.

4.6.1995

Li Behdînan, li warê Oramarê leşkerên ku derketibûn operasyonê, ketin kemîna gerîlayan. Di kemîne de 10 leşker birîndar bûn.

Di 2'yê pûşperê de gerîlayên ARGK'ê bi ser gundê cerdevanên Beytuşa ve ku li herêma Behdînan e, girtin. Di cerda gerîlayan de gelek cerdevan û gerîlayek mirin, gelek cerdevan jî birîndar bûn.

Leşker li deşta Zapê û li nêzikî Xabûrê, li mayînen gerîlayan qelibîn. Leşkerek mir, yek jî birîndar bû.

Li Daristana Kiranê ya ku di nav sînorê Dersimê de ye, di navbera leşker û gerîlayan de lihevxiştinek qewimî. Di vê qewimînê de 4 leşker û gerîlayek mirin.


Li Çiyayê Amanosê ku li herêma Çukurovayê ye, leşker ketin kemîna gerîlayan. Di kemîne de 5 leşker birîndar bûn.

5.6.1995

Gerîlayên ARGK'ê, di 3'ê pûşperê de, riya Bilîsê û Amedê birîn. Gerîlayan li der dora rê jî li 6 cihî kemîn danîn. Li gorî agahiyên, di kemînan de gerîlayan 2 panzer û 4 cemse îmha kirin. Der heqê mirî û birîndarên hêzên dewletê de agahî bi dest neketin. Gerîlayan 6 kes jî di kontrolê de ji bo pirsîyariyê, bi xwe re birin.

Hêzên dewletê, li Behdînan li Çiyayê Garê ketin xefika hêzên ARGK'ê. Di xefikê de 7 leşker û gerîlayek mirin, 2 gerîla jî birîndar bûn.

Li Çiyayê Cîloyê, gerî-



Yek ji qumandarên ARGK'ê Şemdîn sakik (Şemo).

layan li 6 deverî leşker xistin kemîne. Di vê cerdê de subayek jî di nav de 8 leşker birîndar bûn.

Cerdevanên ji herêma Behdînan, li Zozanê Sîlo ketin xefika gerîlayan. Di xefikê de 2 cerdevan mirin.

Li Çiyayê Cûdî, li Warê Hesênayê, hêzên dewletê, li mayînen gerîlayên ARGK'ê qelibîn. Di bûyerê de leşkerek mir û yek jî birîndar bû.

6.6.1995

Hêzên artêşa tirk li Behdînan li warê Bezeleyê ketin kemîna hêzên ARGK'ê. Di kemîna hêzên ARGK'ê de 4 leşker mirin. Dîsa di eynî rojê de, gerîlayan li vê herêmê êrişek birin ser leşkerên ku li wir bi cih bûbûn. Di êrişê de 8 leşker, astsubayek û cerdevanek mirin, 4 leşker jî birîndar bûn.

Hêzên ARGK'ê û hêzên dewletê, li Behdînan di navbera Girana û Fethê de li hev xistin. Di

lihevxiştinê de 2 leşker û gerîlayek mirin.

Di 5'ê pûşperê (hezîran) de li Midyadê, cerdevanên gundê Mîgreyê li nêzikî gundê xwe ketin kemîna gerîlayan. Di kemîne de 3 cerdevan mirin. Li ser vê bûyerê, cerdevanên derdora gundê mudaxelî şer kirin. Di vê lihevxiştinê de jî 4 cerdevan û gerîlayek mirin, 5 cerdevan jî birîndar bûn.

7.6.1995

Li Heftanînê, roja 5'ê pûşperê, li Girê Meymurn, li Warê Alîş û Girê Becelik, di navbera gerîla û leşkeran de li hevxiştinên dijwar qewimîn. Di encama lihevxiştinan de, der heqê mirî û birîndarên her du aliyên de tu agahî bi dest neketin.

Li Elkê (Beytûşebap) dewletê dest danî ser sîlehên 40 cerdevanên gundê Dolerê. Li gorî agahiyên, hêzên dewletê jî ber ku cerdevanan nexwestine derkevin operas-

yonan, sîleh ji wan standine.

Gerîlayên ARGK'ê roja 3y'ê pûşperê avêtin ser navenda bajarê Dersimê. Gerîlayan di êrişê xwe de avahiyên dewletê gulebaran kirin; di êrişê de 2 polis mirin û 4 polis jî birîndar bûn.

Hêzêke gerîlayan di 4'ê pûşperê de, li Çelê (Çukurca) avahiyên dewletê û lojmanên polîsan dan ber guleyan. Di gulebaranê de, li gorî agahiyên çavkaniyên herêmê, 3 endamên hêzên dewletê mirine.

Li gundê Sîmek ku li ser Bilîsê ye, 5 kes ji aliyê gerîlayan ve hatin girtin. Li gorî agahiyên, kesên ku hatine girtin, ji ber ku bi veşartî cerdevanî dikirin, hatine girtin.

8.6.1995

Hêzên artêşa tirk li Botan, li warê Garisayê, ketin xefika mayîne ya gerîlayan. Di xefikê de 5 leşker bi mayînan birîndar bûn.

Gerîlayan di 6'ê pûş-

perê de, riya Qilaban (Uludere) û Elkê (Beytûşebap) xistin bin kontrola xwe. Di kontrola rê de gerîlayan dest danîn ser hin malzemeyên leşkeran û 2 kes jî bi xwe re birin.

Gerîlayên ARGK'ê êrişî Tabura Yekmalê kirin. Di êrişê gerîlayan de cerdevanek û 4 leşker mirin. Eynî rojê gerîlayan bi ser Tabûra Xabûr ve girtin û di êrişê de 3 leşker mirin.

9.6.1995

Hêzên dewletê li Çelê (Çukurca) gundên, Jiyanîş, Çivîş, Bese, Marufa û Beken dane valakirin û şewitandin. Der heqê aqîbeta gundiyan de agahî bi dest neketin.

Leşkerekî li dora Tabura Girdanayê, pêl mayîna gerîlayan kirin. Leşkerek bi teqîna mayîne birîndar bû.

Li Botan li Çiyayê Gabarê, gerîlayan êriş birin ser leşkerên ku li Girê Şehîr Osman cih girtibûn. Di êrişê gerîlayan de gelek leşker mirin û birîndar bûn. Der heqê hejmara mirî û birîndaran de agahî bi dest neketin.

Gerîlayên ARGK'ê li Çiyayê Meretoyê ku di nav sînorê Sêrtê ye, cerdî hêzên dewletê kirin. Di cerdê de 15 leşker birîndar bûn.

10.6.1995

Di 6'ê pûşperê de, erebeyeke leşkerî (Reo) di navbera gundên Şaxê û Kokeb de ku li ser Gevêrê (Yüksekova) ne li

mayîna gerîlayan qelibî. Di bûyerê de 6 leşker û subayek mirin.

Gerîlayên ARGK'ê êrişî Tabûra Xabûrê kirin. Di êrişê de gerîlayên tabûr gulebaran kirin û vekîşyan. Li gorî agahiyên Kurd-A'yê, di êrişê de 6 leşker mirine.

Li Elbakê (Başkale) ji cerdevanên gundê Xodî 16 heban dev ji cerdevaniyê berdan û sîlehên xwe teslîmî dewletê kirin.

11.6.1995

Firokeyên artêşa tirk, li Botan li warê Bestler û Ruserê bomberan kirin. Li gorî agahiyên, car-caran balefirên dewletê jî van deran bomberan dikin.

Li Gevêrê, li gundê Kuçeyê, 4 şivan ji aliyê leşkeran ve hatin kuştin.

Cerdevanên Begejneyên herêma Çelê di navbera gundê Şafata û Besofrayê de, li mayîna gerîla leqîtin. 2 cerdevan mirin, 2 cerdevan jî birîndar bûn.

Li Midyadê, cerdevanê gundê Satayê, pêl mayînen gerîla kirin. Di teqîna mayîne de cerdevanek mir, yek jî birîndar bû.

12.6.1995

Hêzên dewletê operasyona xwe ya li Çiyayê Gabarê sekinandin. Li gorî agahiyên ku ketin destê me ev yek ji ber êriş û cerdên gerîlayan qewimiye.

Di navbera Sêrtê û Berwarî (Pervarî) de, gerîlayên ARGK'ê, cerdevanên gundê Şus xistin kemîna xwe. Di kemîne de gerîlayan 8 cerdevan kuştin, yek jî birîndar kirin.

Li Behdînan, li gundê Giza Reş, dewletê dest danî ser sîlehên 40 cerdevanî û 12 leşker jî tewqîf kirin. Dîsa li gundê Zavîta 36 cerdevanî dev ji cerdevaniyê berdan.

Hêzên dewletê li Çelê (Çukurca) li Zozanê Sîloyê, ketin xefika gerîlayan. Di xefikê de 2 leşker mirin.

Gerîlayan, di operasyona hêzên dewletê ya di navbera Xanî, Licê û Pîranê de cerdî leşkeran kirin. Di van êrişan de 8 leşker û 2 gerîla mirin.

Di navbera gerîla û cerdevanan de, li Motkayê, li gundê Kaşakê lihevxiştinek qewimî. Di encama lihevxiştinê de 6 cerdevan û 2 gerîla mirin.

Kurd-A/Welatê Me

## Muhleta efûya gerîlayan qediya

Gerîlayên ARGK'ê di 8'ê pûşperê de li Amed, Mêrdîn û Êlihê êrişî cerdevanan kirin. Di cerdên gerîlayan de 7 cerdevan û gerîlayek mirin, 4 leşker û 2 cerdevan jî birîndar bûn.

Li Amedê, gerîla bi ser gundê cerdevanên Ferşika ve girtin. Di cerda gerîlayan de 3 cerdevan jî di nav de, 5 kes mirin, 4 leşker û 2 kesê sîvil jî birîndar bûn. Dîsa di eynî rojê de li Mahsertê, piştî êrişê gerîlayan 2 cerdevan mirin. Li Çiyayê Meretoyê di navbera Êlih û Bilîsê de ye, di navbera leşker-cerdevan û gerîlayan de şerekî dijwar qewimî. Di lihevxiştinê de cerdevanek û gerîlayek mirin, 2 gerîla jî birîndar bûn.

## Li Yekmalê 26 leşker mirin

Gerîlayên ARGK'ê di 10'ê pûşperê de, li nêzikî gundê Yekmalê ku li ser Gevêrê (Yüksekova) ye êrişî leşkeran kirin. Di kemîn û êrişê de 26 leşker mirin.

Li Gevêrê, li nêzikî gundê Yekmalê, gerîlayan di navbera warê Muşanê û Vargenima de leşker xistin kemîna xwe. Di kemîne de di navbera leşker û gerîlayan de lihevxiştineke dijwar qewimî. Di encama bûyerê de, li gorî agahiyên ajansa Kurd-A'yê 26 leşker û 2 gerîla mirin. Piştî êrişê gerîlayan hêzên dewletê li herêmê dest bi operasyonê mezî kirin. Di operasyonê de herêm bi top û firokeyan tê bombebaran kirin.



# Zaraveyên kurdî û xwendina bi kurdî

... Rêziman li fêrgehan ji binyad bête guherîn û rêzimanekî berawerdî (beremberî) li fêrgehan bê xwendin û li hemû polên (sinif) dibistanê bête fêrkirin.

... Waneyên (sinifên) xwendina kurdî ji refa çaran (4) bi herdu zaraveyan (Kurmançiya jorîn û jêrîn) bin.

... Xwendin ji bo her sê salên destpêkê li her deverê bi zaraveyê wê bête kirin.

hemû zaravên kurdî zimanekî nûjen peyda bibe. Ev yek bi hizra min, hizreke utopîk û fantazî ye û tu caran cih negirtiye. Hizreke din, di van salan de peyda bûye, ev hizr dibêje bila her zaraveyekî kurdî di cihê xwe de pêşkeftinê bike û pêşeroj gotina xwe bibêje. Dîsa tîrsa mezin ji vê hizrê ew e ku ji çar zaravan çar zimanên kurdî yên cihê peydabibin. Helbet piştî vê rêzîkirinê pêdivî ye refek ji desteka zaraveparêz neyê ji bîr kirin û ew kesên ku daxwaza patromekirinê (têkil-di nav hev de) dikin ji ev in. Yanî zaraveyekî hîlbijêrin û bi zaraveyê din patrome bikin.

Heçî wekî zaravekî kurdî kêmasî tê de hebit, divê bi yên din temam bikin. Bi hizra min lazim e berî her tiştî ev rastî bêne dîtin:

1- Kurmançiya jêrî (sorani) li Kurdistanê Başûr di gel kêma û kur-tasiyan, rolekî mezin di qada rewşenbiriye de le-yistiye û her ji berde-wam e. Li fêrgehan xwendin, perwerdeyî, pirtûk, rojname, kovar, kargeriyên dew-letê...hwd.

2- Li Kurdistanê Roj-hilat (Îran) piraniya ber-hemên belavbûyî û yên wê bêne belavkirin ew ji bi kurmançiya jêrîn in û hinek ji wan di pêşxistinê kurmançiya jêrîn de rolekî mezin listine.

3- Li Ermenîstanê kurmançiya jorîn di gel kurmançiya jêrîn hev-çerx e. Li fêrgehan kur-mañçiya jorîn hate xwendin. Ji aliyê teoriyê ve pêşkeftineke baş kiriye, lê ji aliyê karweriyê (pratik) ve hê ji baş ne-bûye. Helbet ev yeka ha ji ber du egeran wisa bûye.

a- Ji bo kurdên Er-menîstanê xwendina zimanê kurdî, wekî xerekê hatiye hesibandin, yanî ne desthilatekî kurd pê-re bûye. Bi vî awayî ji mirî nemaye û cihê xwe parastiyê.

b- Zimanê edebî li wê derê di kevil û jan-keke berteng (di cihekî teng) de hate xwedîkirin. Qet pêkul nekir ku ji



Televizyona MED'ê ji bo yekkirina zimanê kurdî xebatekî bi rûmet dimeşîne.

kakilê axaftinên kurdên wê deverê derkeve û heger em di gel xwe rast-go bin, dê emê bibêjin gelek ji rewşenbîrên kurd li Dihokê (Behdînan) bi başî nivîsarên wan guhsazî nakin. Ber-evajî fêrgeha Bedirxaniyan û hevbendên wan li Kurdistanê Rojavayê (Suriye) ku ta radeyekê bi zimanekî standart û hemdem yê kurdî nivîsîne.

4- Di van salên dawî de bizavek (tevgereke) ketiye nivîsara kurdî li Kurdistanê Dayik. Lê di wan nivîsarên ku digihîjin me de gelek çewtiyên rêziman hene. Helbet du egerên vê yekê ji hene. Qedexkirina 70 saliya zimanê kurdî, di gel piraniya nivîsaran, xelkê bajarên Kurdistanê ku li jêr sîbera (ji ber siya) zimanê tirkî yan dîrwelatî û zimanekî kurdî yê lawaz bûne.

5- Li Kurdistanê roj-ava (Suriye), nivîsîna kurdî bi kurmançiya jorîn gelek pêşketî ye. Bi rastî nivîsarên wan ji aliyê zimên ve hêja ne, berde-wamiyeke hêja yên Hawarê ne û çavên me pê-ronî bûne.

6- Li Kurdistanê Ba-şûr kurmançiya jorîn, nexasme em dikarin bibêjin piştî salên 70'yî cihê xwe girtiye. Piştî Serhildana Adarê (1991) wekî zimanekî edebî ha-

tiye pêş û berde-wame. Li Kurdistanê Rojhilat di heman (eynî) zaravayî de hindêk deng car car bilind dibin.

7- Li Ewropayê kur-mañçiya jorîn pêşkevti-neke baş kiriye, lê mixa-bin nivîsarên wan nagi-hîjin Kurdistanê. Em di-karin bibêjin ew edebê kurdî yê dîrwelat e.

8- Zazakî (Kirdkî) di van salên dawiyê de he- virkiyeke baş digel ma-yin û nemanê dike û hindêk nivîsarên hêja pê-tê nivîsîn. Anku (yanî) ew ji piç-piça xwe dikşî-ne meydana nivîsînê.

9- Hewramî ji bilî hindêk dengên bêxwedî, her çî dewlemendtirîn û kevintirîn zaraveyê kurdî ye û pê edebê kurdî yê klasîkî hatibe nivîsan-din ji, ew wekî zimanê axaftinê maye.

10- Niha hevrikiya mezin û rast di navbera kurmançiya jêrîn û jorîn de peyda bûye. Kurman-çiya jorîn bi hejmara mi-rovên xwe û berdewa-miya bêrawestan, nivî-sarên kurmançiya jêrîn bi edebê xwe nivîsiye. Tiştê ku terazî aliseng (tercîh) dike, ew e za-ravê kurmançiya jorîn li hemû parçeyên Kurdis-tanê pê diaxivîn. Ev ji bûye çekek di destê zimanê kurdî de li dijî parçebûnê û peydabûna zimanê kurdî li gorî za-rave û devokên Kurdis-

tanê.

**Îro û sibe:**

Îro Kurdistan, parçe parçe ye û kawdanên cî-hanê (heyetên navnete-weyî) ber bi standina mafên neteweyî ve di-çin. Lê nîşanên Kurdis-tana yekgirtî îroj ne li ber çavan e. Lewra ew tiştê li ber çarçova kurd dide zanîn li her perçe-yekî mafên xwe yên ne-teweyî bi rengekî ne mî-na yên perçeyên din werbigrin. Angu li her perçeyekî zaraveyê wê bibe zimanê edebî. Bi wateyek din cihê du za-raveyan di hin zimanên kurdî peyda bikin. Lê qezenca zimanê kurdî ew e ku li hemû perçe-yan bi kurmançiya jorîn tê axaftin.

**Çare çî ye?**

Îro li Kurdistanê Ba-şûr, delîveke baş bi dest ketiye. Nexasme li Kur-distana Başûr ji herdu zaraveyên kurdî yên se-rekî yên ku pê tene xwendin û nivîsandin, terazû bi aliyê kurman-çiya jêrîn ve diçe. Li vir û vê rojê em hewceyî bi zaravekî ne. Nexasme desthilata siyasî îro di destê kurdan de ye, lêw-re ji livîn pêdivî ye, divê ne li bin sîbera zarave-parêz be. Pêdivî bi livî-neke kurddarêz heye; ji bo ku zimanekî yekgirtî hebe. Ez wekî qonaxeke destpêkî ferz dibînim ku ev tişt bêne kirin:

1- Rêziman li fêrgehan ji binyad bête guhe-rîn û rêzimanekî bera-wardî (beremberî) li fêrgehan bê xwendin û li hemû polên (sinif) dibis-tanê bête fêrkirin.

2- Waneyên (sinifên) xwendina kurdî ji refa çaran (4) bi herdu za-raveyan (Kurmançiya jorîn û jêrîn) bin.

3- Xwendin ji bo her sê salên destpêkê li her deverê bi zaraveyên wê bête kirin.

4- Danana (hazirki-rin) zaraveyên zanistî, pêdivî ye li bin çavdêrî û serpereştiya (sîdar-îs-raf), kombestek (komîte) zimanzanan be. En-damên wê ji ji hemû Kurdistanê bin û rê ne-din herkesî ku zarave-yan ji bêrika xwe (ji ber xwe) derînin. Kombes-ta zimanî di nêzîktirîn dem de ferhengên zi-manê kurdî amade bi-kin.

**Encam:**

Piştî ku van formên xwendinê cihê xwe gir-tin, wê qonaxeke tégihîştî peyda bibe û helbet tégihîştin armanc û dax-waza dumahîkê ye.

**Têbînî:** Ev gotara han ya Dr. Fadil Omer ji ko-vara "Peyv", organa Ye-kîtiya Nivîskarên Kurd-Dihok, hejmar 2-1994 ve hatiye stan-din. Veguhestina wê ji tîpên erebî Fener Rojbi-yanî kiriye.



ÇIROKA JIYANA MISTOYÊ KU JI DIYA XWE BÊDENG KET

# KELDÛMAN

Çiroka jiyana Mistoyê ku ji diya xwe bédeng ket,

û bédeng jî, êgir laşê wî hêdî hêdî dixwar.

Misto li ber neynikê bédeng û bi tenê rawestiya bû, keldûman jê diçû. Di nav dûmanê de mat mabû. Bi berbangê ji xew veciniqî, xuşexuş ji serê wî dihat. Laşê wî sincirî bû. Bilez çû ber neynikê û li xwe nêrî: -Yadêêêê... ev çi ye?

Tu çi bibînî, nêrî ku dûman jî guh û devê wî dertê. Ji nişka ve bi her du destan zêft bi guhên xwe girt. Devê xwe jî girt. Nalînek ji kûrahiya dil kişiya, xuşexuş di serî de xurtir dibû, nû Misto nas kir ku keldûman jê diçû û piştî çend katjmêrên din çênîyek goşt bi laşê wî ve namîne. Ket ramanên reş, bi tirseke zor û giran; "Gelo wê hestiyê min jî bibin dûman, yan ezê bimînim komek hestî...!" Li kemenceya xwe geriya, di ber xwe de got: "-Belkî xewn be."

Her ku diket tengiyê, gerdûn li serê wî dihat hev, dibezî kemenceyê, lê wê carê berî ku dest dirêjî têla wê ya şêrîn, bike dît ku agirêkî hûr jî têlan hildikişê û kemenceya wî dûman jê bilind dibe. Bi rûyekî guvaştî, laşekî lerizî vegeriya ser nivîna xwe, xwe dirêj kir û bi tiliyên bêneynûk axa dîroka xwe ya windayî kola...

- Ji diya xwe ket... bitenê. Xweşiya zaroktiyê nedît. Xortanî bi tenê jî niha laş û can hêdî hêdî dibê dûman û li valahiya ezmên winda dibe.

Weyyyy... li min û li vî temenê vala û pûç!

Lê dengê axûna Misto nedîçû kesekî, ji ber ku di qatê şeşan de bû, ji avahiyeke dûr. Kê pirsra mala wî dikir, digot: "Ez çiranê Xwedê me." Bi vê bersivê, xwe jî ber mêvanan dida alî, tevî ku bi dehan hevalên wî jî xortên zanîngehê hebûn. Lê xwesteka xwediyê xanî dema ku Misto kirê kir ev bû: "Divê çûn û hatin li ba te tunebe."

Ji neçarî û kêmpertiyê xwesteka wî qebûl kir û ji xwe re digot: "Ev mirov çi dewar e! Nizane ku kemenceya min

beramberî sed mêvanî ye. Lê Misto jî nizanibû ku her tiliyên wî yên sivik kemenceyê hildidin ser piyan. Hêsirên zelal ku hûr jî çavên reş û xilmaş dihatin xware li qatê pêncan û her êvar xwediyê çavên reş û xilmaş tevde dibûn guh, li hêviya dengê kemenceyê. Şeva ku nalîna kemenceyê bilind nedibû xew jî nêzîkî çavên reş û xilmaş nedibû. Lê Misto mabû dilê çavên "Bêmal" a kambax, tevî ku bi salan wê nabîne, lê wek diya wî digot: "Dil dil e ne sênîk burxul e". Tevî ku wê dil nedîtibû jî, lê heta roja îro serî bilind dikir û pesnê xwe dida ku heta mirinê jî bavê Misto re negotiye û nabêje: "Na" û demek nimêj lê neçûye, ji ber vê yekê, hêviya wê bi buhuştê xurt e.

Lê nizanîm çima li rabûn û rûniştinê, li çûn û hatinê tim digot: "Xwedêyo tu me biparêzî ji "Munker û Nekîr" jî agirê dojhê." Di wê kêlîkê de parçeyê sax ji laşê Misto dawerivî.

**Misto li ber neynikê bédeng û bi tenê rawestiya bû, keldûman jê diçû. Di nav dûmanê de mat mabû. Bi berbangê ji xew veciniqî, xuşexuş ji serê wî dihat. Laşê wî sincirî bû. Bilez çû ber neynikê û li xwe nêrî: -Yadêêêê... ev çi ye?**

Demekê zarok bû... Radihişt pirtûkên jî xwe girantir û berê xwe dida dibistanê, mamosteyan tevan jê hez dikirin tevî ku gemar gelek çaran dibin neynûkê wî de hişk dibû. Ji bîra wî naçe sala ku rêza (sefa) çaran bû, mamosteya "Rojîn" ew fêr dikir. Dema ku Rojîn dikirî bihata guhertin bi mamosteyekî din, Misto serî danî ser maseyê û bû kûrê kûra wî û giriya. Mamoste lê civiyar û pirsîn: "Tu çima digirî?" Çavên xwe yên sor tijî hêstir xiste çavên wan: "Ez jî mamosteya Rojîn hez dikim. Naxwazim ji me dûr bikeve, naxwazim!" Girî bi hewar û keser berdewam kir. Lê Rojîn çû bêveger. Ji mêj ve wê şagirtê xwe Misto

ji bîr kiribû, lê Misto heta niha her tiştî li ser Rojînê dizane; mêrê wê kî ye zarokên wê çend in, navên wan çi ne...? Ji dûr... Ji dûr; heta ji nişka ve piştî gelek sal mîna bombeya nitronî hezkirina "Bêmalê" keça Rojînê di dil de teqiya û pişiqî. Pirîskê evîna wê bû çemekî ji êgir. Bû deryayekî dadayî û nema vemirî. Berî vî tiştî, her Misto mezin dibû, bavê wî jî digot: "Va ye dokorekî me jî çêbû." Lê Misto bi qutiyeke helaw û penêr û mûyên teryên hespan daketibû. Tembûr jî xwe û zarokan re çêdikirin. Qir dikirin stran, beyî ku zanibin çi dibêjin. Her ku zivistan dihat hevdu talan dikirin û derdiketin "Bûka baranê", her yekî paçîkek li serê darekî.

"Xwedêyo...Xaka me tî nehêl

Zarokê me birçî nehêl Xwedêyo...Kesî me tune j'pêvî te

Vê carê tenê bibîn halê me."

Geh ewr hişk dima, geh jî baran dibarî, yan jî

roj geştir dibû. Hîn ewr û kevir û hesp û Bêmalê û gor û baran û roj û gumlik di serê wî de li nav hev diketin. Parçekî din jî laşê Misto dawerivî û bû dûman. Roj bi roj nas kir piştî diwazdeh sal xwendin ku hatiye axurekî. Ev nezangeh e, ne zanîngeh e".

Hêdî hêdî hêviya wî dirêj digeland, radikir jor û bi hev re dikirin qêrîn:

"Ya rebbî baran bê.. a mîn. Golka me giha divê... amîn. Zik birçiyê nan divê... amîn. Me j'Xwedê baran divê ... amîn."

Û li cihekî din jî deng bilind dibûn: "Baranê bibar bibar. Çûçika genmê me xwar. Sêwiyan serê hev xwar."

Geh jî dida dû bavê xwe yî "Hecî", gumlikê xwe yî bipîne berevajî li xwe dikir û derdiket nimêja baranê, li ber goristanê, dest bi sedan ber bi jor vedibûn û hezar deng dibûn yek: Bi dîtan xort û keçên rewşenbîr windabû. Nemaze salên pêşî, ket derya rêzaniyê û "Xebata ji bo welat" bigermî kar kir û her sal digot: "Îsal sala me ye. Îsal emê cihanê bihejinin û armancên xwe bi alîkariya dostan pêk bînin."

Lê, sal bi sal dem diçû. Ne salek xweş hat, ne kesî cihan hejand, ne jî dost man. Hew, kuştargeh pirtir dibûn, karê wî mabû hejmartina partiyên û zayîna wanî her mehî. Çiroka gamêşan hate bîra wî. Goştîroş gamêş giş dajotin ber serjêkirinê, gamêş jî bi rê ve li hevdû siwar dihatin. "Yê dilpak li jêr dima, yan bi bêbextiyekê wî davêtin nav şekalan, bi tirşik û goşt û girarê hevdû razî dikirin û dibûn serdar û "Serok" Xêza xwar ji gayê pîr e. Ka wê Mistoyê pepûk di nav beroşên tirşikê û germiyê de çi bike, ji pêvî ku rahije kemenceyê û ji "Bêmalê" bêbext re saz bide: "Ey dilkoçerê, rû pêxemberê, bûm kulek arî, te'z dêram lirê..."

Misto diçû, dihat, her digot: "Gurî bûye sermiyanê mala bavê min, tu çima nabêjî mala bavê min qeliyaye looo...!" Bi vî awayî jî her sal di xwendinê de, li şûn dima. Piştî heft salan, nû bû sala sisêyan, bavê wî di guhan de her dikir pitepit: "Heso" li gundê me hebû, Heso her nifşek zarok li gund mezin dibû, Heso jî bi wan re dibû heval, wekî ku di temenekî de ne. Wekî Heso li te hatiye lawo Misto."

Bi babidestî serî dihejand: "Hoo...weh, çi bênamûs jî piştî min ketine lo...!" Diya wî ew di nav gazinan de dihişt: "Bixwîne law... bixwîne, bi Xwedê te em merezî kirin lo."

Heta vir, perçakî din jî laşê Misto dawerivî. Xwe dît di nav bazara zebeşan de, li kemenceyê jî germ bûbû, hawîrdora



wî mişt qîz bûn, di bin simbelan re dikeniya û digot: "Çiqas qîz pir in lo!" Piştî çend salên din digot: "Çiqas qîz pir in, hewqas hindik in jî!" Ew kî bû digot; "Jin hene û jinkok hene, lê çima şensê min tim li jinkokan rast tê, ez nizanîm."

**EMÎNA**

Kezeb lê reş bû, heta ku Emîna anî mal, nû ew hembêz kir, kabokên wê li hev ketin û lerizîn: Emîna, çib'te hat, çi bû?! Rûzer û çilmisî got: "Ez ditirsim."

Misto elektrîk vemirand, sûde nekir, rabû ser xwe sûde nekir, li ber geriya sûde nekir, hema rabû û xwe tazî kir. Emîna jî kabok lê bêhtir lerizîn û dest bi girî kir. Ew cara dawî bû ku rûyê Emîna dît.

**CEMÎLA**

Kêfa xwe pir ji Misto re anî. Wî jî hêdî hêdî xwe nêzîkî wê dikir. Heta rojekê rahîst destê wê. Cemîla veciniqî, keniya, rû sor bû. Têgihîst Misto çi dixwaze, serî hejand: "Xem nake sibe ezê bêm cem te." Bû sibe. Cemîla hat. Lê xortekî qelew û dirêj pêrebû, Misto got: "Îca, ev kî ye?"

Cemîla biken lêvegerand: "Ev desgirtiyê min

e. Beroşek ava sar bi ser serê Misto de rijiya."

**FERÎDE**

Du mehên dudurêj ji Misto hez kir, xwe dikir heyrana wî jî. Li kemenceyê dixist û geh jî distira, lê destpêka meha siseyan Ferîde jê re got: "Ez nema ji te hez dikim." Misto dîn bû eman, zeman, hewar, bi pozbilindî gotina xwe berdewam kir: "Ev dilê min e û ez azad im." Misto li ber rûnişt, lingê wê ramûsand, kelagirî kete qirikê, rî dirêj kir, xew lê bû hesret, bû ta û derzî. Ferîde niha bi serê lêvan silavê li Misto dike, yan nake.

**ZEYNEB**

Roja yekem Misto nas kir û jê hez kir. Roja du-duyan ji Misto re got: "Ezê jî te hez bikim heta mirinê." Roja siseyan Misto bihişt ku Zeynebê yek revand. Şivek tûj li serê pozê wî ket...!

**ŞÊRÎN**

Misto dabû dî Şêrînê, xweşka qîzên kurd teva li zanîngehê, ji ber ku yên xweşik di nav wan de gelekî kêm bûn. Dused xortî bi hev re didan dî Şêrînê. Misto yê zexel jî yek ji wan bû, pirê wan kinik, yan reşik, yan jî xwînsar bûn. Misto tim





jê hez bike, ew mêr xwe bikuje jê re çêtir e. Bêmal hat bîra wî û bû gumîna agir di dilê wî yê şewitî de. Çîroka din jî ev bû: "Pismêm dotmam dixwest, dotmamê jî çû yekî xwe kir, wî jî jinek anî, dotmamê bipoşmanî digot:

"Tivinga lawikê min nesranî, m'berda kelê kel hilnanî

Ne mêrê min kir, ne jina ku te anî"

Disa hat bîra wî, dema Bêmalê por berdida, sed şax li ser piyan şîn dihatin. Carekê jî Bêmalê sînga xwe jêr vekir, dused kevok jê firiyân, lê cara ku destê xwe bilind kir: "Bay... bay", sêsed kêr di dilê wî de çandin, niha jî dilê wî xwest helbestekê saz bike li ser Bêmalê:

"Bêmalê/ Te ez kirim bêmal/ Ez hiştim zuxurê kevî li çiyayekî ku gur tenê lê hene/ Lê çîbikim/ Ez û ev kemence ne/ Ne tilî bi min ve man/ Ne jî tîl bi kemenceyê ve man/."

Misto xwe dît bi tenê ye, hevalên wî xwendin kuta kirin, ê bû mamoste, ê bû bijîşk, ê bû ebûqat, bûn bi jin û mal, hinek jî li serê çiyân bûn pakrewan, hinek bûn pêşmerge, çerxa demê lê fitilî û ma li şûn. Hîn xort bû girêkên pîrbûn û mirinê ew kiribûn xaniyekî bêxwedî û riziya-yî... vê gavê...

Perçeyê dawîn ji laş û canê Misto dawerivî.

Xwedîya çavên reş û xilmaş ya qatê pîncan li hêviya dengê kemenceyê din bû, dihat ku xwe bixwe. Sê rojan ne dengê kemenceyê, ne jî dengê lingên xwedîyê wê hat. Bi bêhneke teng derket devê derî bêhna dûmanê hat, beziya, çû jor, li derî xist, kes nehata, bêhna dûmanê bilind dibû, kir hewar: "Agir bi qatê şeşan ketiye, agir!" Xelkê avahiyê tev civiyân, bazdan ber bi qatê şeşan ve, derî şikenandî û ketin hundir. Herdu çavên reş û xilmaş mat man, xelk tev behetîn.

Xaniyekî vala û bêdeng. Li jêr kemence bibû kulmek arî. Li jor jî dûmanekî tarî bikerb dilîst. Bi vekirina derî re dûman derbas bû, poz û dev û çavên xelkê, bû kuxte kuxta wan û zarokên wan, kuxte kuxte kete nav cîranan, kete nav tariyê, nav bajêr û nav gundan, bû kuxte kuxta miriyên mezelan.

EBDULHELÎM YÛSIF

digot: "Trên li orta me ket." Rojekê ew û Şêrinê li hêv ya postakê bûn, dema Misto xwe amade kir ji bo silavê, Şêrinê berê xwe guhert. "Tifû... li bextê reş, şensê pîs. Poste hat, mişt bû, her Misto rûnişt, Şêrinê şipya ma, ji ber rabû, bi dengê nizm û birûmet got: "Fermo Şêrinê rûnê." Şêrinê bilez ji postê daket. Li sînemaya zanîngehê cih tunebûn, cihek tenê vala li cem Misto hebû. Şêrinê hat, gul li rûyê Misto şîn hatin. Çare tune, divê li cem wî rûnê. Lê Şêrinê şipya ma û rûnenişt. Misto jî bi ibrî û yewnanî dest bi xeberan kir.

Her wiha qîzek bi dû qîzekê de ji ezmanê dilê wî hildiweşiyân û her carê jî kula Bêmalê mezintir û girantir dibû. Bi bawer bû ku evîn û mirin yek in. Herdu carekê tenê tîn.

Têbîrên wî keliyan. Keliyan heta ku, perçekî din ji laşê Misto dawerivî, Pîrika wî "Fatê" hate bîra wî, dema çîrokên evînê digotin: "Hesenê mala Mûsa ez te nakim, tu b'gul û endeko be li nava buharê ez pêl te nakim, tu b'werisê şala bî ez bi te barê xwe bar nakim".

Te dît lawo Misto ku jin jî mêr hez neke û mêr



## Ji zarokên NÇM'ê defîleya kincên neteweyî

**Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM), li Stenbolê şahiyek li dar xist. Şahî, ji aliyê Yekîtiya Malbatên Mezopotamyayê ve, ji bo tatîla zarokên ku li navendê perwerdehiyê dibînin, hatibû organîzekirin. Di şahiyê de tiştê ku pir bal kişand ser xwe, defîleya kincên neteweyî bû.**



Dîmenek ji defîleya kincên neteweyî

Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM), di 11'ê pûşperê (hezîran) de li Stenbolê şahiyek li dar xist. Şahiya NÇM'ê ya ku li Navenda Kulturê ya Ortaköyê (OKM) çêbû, ji bo tatîla zarokên ku li navendê perwerdehiyê dibînin, hate organîzekirin.

Şahî, bi pêşkêşkirina keçik û lawikekî ku li NÇM'ê perwerdeyî dibîne hate vekirin û bername bi kurdî-tirkî hate xwendin. Ji bo giramgiriya şehîdên Kurdistanê, deqeyekê li ser piyan hate rawestîn. Di vê navê de koroyek ku ji 75 zarokan pêk hatibû, merşa neteweyî Ey Reqîb xwend. Li ser navê NÇM'ê Şevîn Civa knasê dest bi axaftina xwe kir û bi awayekî dorfireh qala xebata saziyê ya sala 94-95 kir. Civaknas li ser sebebên a v a b û n a NÇM'ê ev got: "Li ser hêja hiyên têkoşîna azadiya Kurdistanê, gelê kurd sazgehên xwe yên neteweyî ava dike. Di sala 1991'ê de ji bo birêvebirina xebatên

zanistî, hunerî û çandî NÇM (Navenda Çanda Mezopotamyayê) hatiye avakirin.

Navenda çanda me bi xebat û berhemên xwe dixwaze gavên ber bi azadiyê ve xurt bike û ji bo ku şerê bi qirêj li welatê me bi serkeftina gelê kurd biqede, dixebite. Armanca NÇM'ê bi awayekî zanistî berhevkirina hêjahiyên me yên çandî û hunerî ye; dixwaze wan bike xwedî giyan û dirûvekî nû û bi awayekî wan bixezîzîna têkoşîna azadiyê."

Piştî axavtinê, zarokan xebatên ku di nav salekê de (folklor, şîir, muzîk û hwd.) kiribûn pêşkêşî mêvanan kirin. Di şahiyê de tiştê ku pir bal kişand ser xwe, defîleya kincên neteweyî (ji aliyê ciwanan) bû. Yek ji tiştê balkêş jî, ji Ehmedê Xanî heta Ferhad Tepe ew kes û şexsiyetên ku di dîroka kurdan de cih girtine bi wêneyên wan, ji aliyê zarokan ve hatin nasandin û bîranîn.

Li hêla din di şahiyê de derbarê girtina NÇM'ya Îzmîrê gelek mesaj hatin. Di mesajên de hate gotin ku ji bo kurdan saziyên wiha, wasîteya belavkirina kultura neteweyî ne û heqê dewletê nîne ku van dibistanan bigire. Di şahiyê de hin bang jî hebûn. Li gorî vê, wê NÇM di heftiya ewil ya meha tîrmehê de ji bo perwerdeyî dest bi qeydên zarokan bike. Yek ji wan bangan jî mizgîniyek bû. Di vê bangê de hate diyarkirin ku wê di 1'ê îlonê Konferansa Zarokên Kurdan, di bin siya NÇM'ê de çêbibe.

Şahiya NÇM'ê, ji aliyê Yekîtiya Malbatên Mezopotamyayê hatibû organîzekirin. Şahî, bi govenda ku mêvan jî beşdar bûn, qediya.

Servîsa Çandê



# Ji zarokên kurd yên li Ewrûpa silav

Deh sal berê li welatê me her tişt mirîbû, dergûş ji dayikên xwe bênav, bêziman, bênasname û bêwelat dihatin dinê. Mejiyê zarokên kurdan bi zorê dihat guherandin û dibûn nenasê neteweya xwe û dîroka xwe. Ên diçûn dibistanên tirkan, her sibe ji bo tirkbûna xwe sond dixwarin û digotin: "Xwezî bi wî kesî ku dibêje, "Ez tirk im." Îro hûn zarokên delal li hemberî tanq û topên xwînxwaran bêtirs dibêjin: "Em kurd in û em mafên xwe yê neteweyî dixwazin, meşan çêdikin wekî Gulên Mezarabotan û diçin heta meclîsa tirkan û bêtirs û bi serbilindî dibêjin: "Heger we 23'yê avrêlê kiriye cejna hemû zarokên dinyayê, em zarokên kurdan jî perçeyekî zarokên dinyayê ne û em jî dixwazin bi nasnameya xwe ya

neteweyî, di vê cejnê de cih bigirin." Bi rastî ev meşa Gulên Mezarabotan em kêfxweş kirin û ev tiştêkî pir girîng e. Ji bîr nekin, heger hûn îro dikarin bipeyivin û dikarin

axa welat, ne bi jiyana li Ewrûpa cihekî din. Mirovên li derveyî welatê xwe dijîn, wekî masiyê ku ji avê dûr ketibe, dipelpite û bêhna wî teng dibe û emrê wî kin dibe.

Duygu (hîn heşt salî ye). Dema min qala Kurdistanê kir, çavên wê tijî bûn, bi xemgîniyê bersiva min da. "Duygu tu çima hatî Ewrûpayê?" Li dê û bavê xwe nihêrî û


got "Tu pir biçûk î" wê got "Bila be, min di tv'yê de dît, zarokan bi keviran êrîşî leşkerên faşîst dikirin. Ma ez ji ne wek wan im."

Belê, li hemberî vê

ewê mutleqa here çiyayên welatê xwe. Hesên, Kenan, Evîn, Newroz, Kemal, jî daxwaza wan ya pêşî çuyina welatê bû. Digotin "Em li vir ne rehet in, çand û jiyana Ewrûpa yê ne li gorî me ye û em li vir wekî sewiyinan in." Rast e, mirovê li derî welatê xwe, sêwî ye û welatê xerîban ji me re nabe war û cih. Ji ber vê yekê ye ku gelê kurd ji bo welatê xwe can û rihê xwe dide. Zane ku heta welatê wî azad nebe, jiyana wî xweş nameşe.

Zarokên li derveyî welat silavên xwe yê germ ji we re diyar dikirin û digotin "Em her tim bi we re ne, emê di demek kin de li Kurdistanê azad, bigihîjin hevdu." Ez jî tevî daxwazên wan im, vê gavê bi xatirê we, bimînin di xweşiyê de.

ROTÎNDA  
YETKÎNER



navê xwe deynin Mazlum, Kemal, Xêrî, Egît, Rodî, Rojda û hwd. hûn bizanibin ku ev ji ber têkoşîna şervanan e.

Zarokên ku li Kurdistanê dijîn, xwezî bi we. Hûnê bibêjin çima? Ji ber ku di nav şer de ber jî, xwezî bi jiyana li ser

Min bi hinek zarokên kurdên li Ewrûpayê re, li ser vegera welat hevpeyvîn çêkir. Hemûyan ji dil û can dixwestin ku di demeke kin de, bizivirin welat û bikevin nav têkoşîna azadiyê.

Ez dixwazim hinek gotinên wan diyarî we bikin.

got: "Wan ez anîm, ez nedihatim. Heval heger tu herî welat min jî bi xwe re bibe"

Zarokino bi rastî Duygu ev xwesteka xwe ewqas ji dil got ku ez ji gotina xwe poşman bûm. Min got, "Tuyê herî welêt çi bikî?" Wê got "Ezê şer bikim" Dema min

bersiva Duyguyê êdî tiştêk nedihat gotin. Min îcar jî berê xwe da Mahsun. Ew deh salî bû, li metropolan mezin bûbû û qet bi kurdî nizanibû.

Bi şiyarbûna dê û bavê xwe wî jî xwe naskiribû. Mahsun qerara xwe dabû ku bi çî awayê dibe, bila bibe

## N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

### Çend daxwaz ji Welatê Me

Xebakarên hêja, silavên şoreşgerî ji we û ji xwendevanên Welatê Me re dişînim. Min heta destpêka weşana Welat bi zimanê kurmancî nikaribû derdê xwe bigota wê çaxê min sozek da xwe min got: "Rojnamevanê me ji bo çî vê xebatê dikin, û tade dibînin û canê xwe ji bo me didin? Wê çaxê mi ji xwe re soz da ku divê xebatên rojnamevanên me vala neçin, bi saya we ez niha zimanê xwe yê bi zikmakî dipeyivim û pê dinivîsim.

Ev name, nivîsa mina yekêmin e, Xwedê her tim alîkarê we be. Heta niha min bi zimanê xwe

nizanibû, lê niha çend rexneyên xwe û daxwazên xwe ji we re bibêjim.

1- Me bêriya Qirixê Doğan Güzel kiriye. Bila Qirix li dewsa Jûjî bi kurdî derkeve, hevalên ez nas dikim wexta Özgür Gündem Qirix dixwendin. Ez wisa texmîn dikim ku Qirix bi kurdî bipeyive wê hevalên dibêjin: "Em ji zimanê Welatê Me fêhm nakin wê xwe bidin ser zimanê kurdî"

2- Di nav Welatê Me de pirsên (gotin, weje) nû ku em jê fêhm nakin hene. Kîjan hejmar be, tê de gotinên nû hebin di wê hejmarê di rûpela 15'an de Ferhangoka wê hejmarê hebe hevalên fêhm nakin wê ji van re rehet be

3- Xaçepirsa derbasbûyî hûn diweşînin, lê pirsên wê nayên xwendin.

4- Di rûpela dîrokê de dîroka ola berê, şovenîzma dewleta romî dî-

roka kurd û îslamê, dîroka bajarên me, jiyana şehîden me jiyana ronakbîrên me (Musa Anter, Osman Sebrî, Cegerxwîn) gotinên wan, pekenokên ronakbîran, rojên wan ên girîng. hwd. divê hebin.

5- Quncikekî ji Apê Musa re, me beriya vî kir. Eger karibin çend hejmar cih bidinê, ezê dilxweş bibim.

6- Di rûpela çand, hunerê de hûn karibin dîroka staranan (wek strana mîrê Hekariya) dîroka kilamê, dîroka staranên li ser şehîdan binivîsin, wê ji bo me, ji bo çanda navneteweyî baş bê zanîn.

7- Di hejmara Welatê Me ya 27'an di rûpela 15'an de quncikê birêz Mazhar Günbat (Welatê Me ji bayiyan bixwazin) Bi îsrar, bi înad, bêtirs ji bayiyan bixwazin ev gotin bû sedema vê nameyê ku ji we re dişînim.

Cembeli Taş

### Xwedîderketina li ziman vejîne

Xebatkarên rojnameya Welatê Me, ji ber derxistina rojnameyê mîna Welatê Me ku li ser çand, ziman, dîroka kurd û Kurdistanê deng û basên ku di dinê de çêdibin di-sekine, em ji we re pir spasdar in.

Bi rastî em her heftî rojnameya Welatê Me distînin, dixwînin û em her gav li hêviya roja yekşmîyê ne ku were û em gavekê zûtir Welatê Me bistînin û bixwînin.

Di vê dema nîjadperstên tirk ên faşîst şerekî taybetî û gemarî li ser kurdan dimeşînin, weşana Welatê Me pir di cih de ye. Lê hema

weşandin bi tenê ne bes e, pêwîst e gelê kurd tev bi zêdeyî li ser ziman, çand û dîroka xwe bisekine û ji bo parastina ziman, çand û dîroka xwe tiştên ku ji destê wan were binin cih û ber bi pêş ve bibin. Ji ber girîngiya çand û dîrokê em mînakekê ji dîroka tirkan bidin.

Li serê sala 1930'ê Atatürk rojekê di navenda saziya Ziman û Dîroka Tirkan (Türk Dil Tarih Kurumu) da dibêje: "Me çima Balkana (Sîrp, Hirvat) û nîjadê her wekî wan ne xistine binê destê xwe û me gelê kurd û Kurdistanê xisteyê binê destê xwe. Dîsa bi xwe bersivê dide û dibêje: "Gelên Balkanan li çand, ziman û dîroka xwe xwedî derketin û çanda Osmaniyan qebûl nekirin û ji bo parastina ziman, çand û dîroka xwe tiştê ku ji destê wan hat kirin. Lê, hema gelê kurd li çand, ziman û dîroka xwe pir xwedî der-

neket û ew neparast. Ji ber vê yekê em îro dibînin ku di çî halî de ne." Bi rastî gelê kurd di van salên dawîn de li çand û dîroka xwe xwedî derdikeve û her roj ber bi pêş ve diçe û her roj deriyên serxwebûn û azadiyê yê nû vedike.

Bi sazkirina "Parlamanê Kurdistanê ya li Derveyî Welat" û bi weşana TV-MED'ê jî gelê kurd gaveke din jî nêzîkî serxwebûn û azadiyê bûye. Ji ber vê yekê daxwaza me ji temamiyê gelê kurd û Kurdistanê ew e ku li ser ziman, dîrok û çanda xwe bi girîngî bisekine û lê xwedî derkeve.

Di dawiya de ji ber derxistina rojnameya Welatê Me ku we barekî giran daye ser milê xwe û rojnameyê wisa û di weşînin, em ji were pir spas dikin. Dema we pir xweş be.


Xwendevanekî  
Zanîngêhî  
Cevat Orhan



Xwendevan ji bo weşanekê, ji Xaliyê giringiyê ve di dereca yekemîn de ne. Sebebê derketina weşanekê ew e ku xwe bide xwendin. Piştî ku xwe neda xwendin, tu wateya derketina wê namîne. Ji ber vê yekê, li gorî giringiya xwendevanan, pêwîst e em guh bidin daxwaz û pêşniyazên wan. Em jî, ji ber vê yekê dixwazin gelek caran li ser daxwaz, rexne, pêşniyaz û nêrînen xwendevanên xwe bisekinin.

Ji ber şertên ku em tê de dijîn, dibe ku heta niha me pêwendiyên xwe li gorî ku tê hevîkirin, bi xwendevanan re sererast nekirine. Lê dîsa jî di çarçoveya derfetên xwe de, emê hewl didin ku van pêwendiyên xurt bikin. Niha tiştê ku ji destê me tê ew e ku em car caran li ser daxwazên wan di vî quncikî de binivîsin û wan ji rewşa rojnameyê haydar bikin.

Di demên dawî de hin tiştên ku ji aliyê gelek xwendevan ve ji me tîst xwestin ev in: Ew dixwazin ku bikarin rojnameyê li



## Jî Welatê Me

MAZHAR GÜNBAT

### Em û xwendevanên xwe

her derê peyde bikin. Qismek ji wan jî naxwazin ji bayyan bistînin û dixwazin ji saziyên kurdan rojnameyê tedarîk bikin. Hin xwendevan hebûna falê di rojnameyê de bêluzum dibînin û rexneyên dijwar li me dikin. Kurdên ku bi zaravayê kirkî (zazakî) û soranî dipeyivin, dixwazin ku em zêdetir cih bidin zaravayê wan. Hê jî gelek kes zimanê rojnameyê dijwar dibînin û dixwazin em bi awayêkî wisa binivîsin ku hemû kurd jê fêhm bikin. Qismek ji wan jî dibêjin, "Fiyeta rojnameyê giran e." Yê ku dixwazin rojname bi temamî rengîn an jî

berevajî reşûspî be, hene. Kurdên başûrê mezin û başûrê biçûk jî gazinan dikin ji ber ku rojname nagihê wan. Bi saya van name û telefonan em xwendevanên xwe her diçe baştir dinasin. Em werin ser tewra me ya ji bo van daxwazan. Helbet ne mumkûn e ku em hemû daxwazan bînin cih. Bicihanîna van daxwazan bi rêjeya hejmarê wan û derfetên me ve girêdayî ne. Mesela eger hejmarê xwendevanan zêde nebe, ne mumkûn e rojname bigiê hemû deveran. Wekî din kurdên ku bi zaravayên kirkî û soranî ji me re nivîsan neşînin, zêdeki-

rîna wan ji bo me, ne hêsan e. Yanê daxwazên li jor eger derfetên me hebin, em dikarin bînin cih.

Li ser hebûna falê û dijwarbûna zimên jî em dixwazin vê bibêjin. Fal ne mijareke pir girîng e. Heta piştî cihekî bêluzum e jî. Feqet eger xwendevan falên me baş bixwînin, wê bibînin ku qet nebe ji bo niha, ne bêluzum in. Di her qutiyeke falê de em gotineke pêşyan didin. Wekî din, yê ku debar nakin nivîsên dirêj bixwînin dikarin bi çend cumleyên falê hîni xwendinê bibin. Lê yê ku kêfa wan ji falê re qet nayê bila falê nexwînin. Dîsa jî piraniyê mezin nexwazin, em dikarin falê rakin.

Gelek kes hê jî dibêjin ku zimanê rojnameyê dijwar e. Esas, heta ji destê me tê em zimên hesan dikin, lê dîsa jî madem xwendevan wî dijwar dibînin, emê hewl bidin ku ji niha û pê ve ziman hêsantir bibe. Ji kerema xwe re daxwaz û rexneyên xwe her tim ji me re bişînin.

## Bi Mele Evdirehmanê Tizyanî re sohbetek

**Çûyina min û Cegerxwîn a Bexdayê**  
Piştî berdana min û Cegerxwîn em çûn Bexdayê. Wê çaxê jî hêla Evdilkerîm Qasim ve ji bo Mele Mistefa Berzanî efû derketibû. Ez û Cegerxwîn çûn Bexdayê Qesra Sebah, cem Mele Mistefa. Piştî 2 mehan li Qesra Sebah civînek pir mezin çêbûbû. Gelek kurdên ku li nav dinyayê belav bûbûn, hatibûn vî civînê.

Kamûran kurê Celadet Bedirxan ji Frensayê hatibû. Di vî civînê de axaftina ku Kamûran Beg kiribû ji vî demê heta îro, ji bîra min naçe. Kamûran Beg di axaftina xwe de bi piranî li ser îxaneta kurdan disekinî.

**Şerê di nav pêşmergeyan û Evdilkerîm Qasim de**  
Di sala 1958'an de Evdilkerîm Qasim û pêşmergeyan Berzanî li hev xistin. Wê demê ez, Elî Eskerî û gelek mamosteyên bi navê Mele Hemdîn, Mele Evdilkerîmê Erohî, Mele Mihe-medê Neyo, Mele Mihe-medê Paloyî û Mele E-lyê Beroşkî em tev di nav "Îstixbarata Kurdistanê ya Lijneya Sûrî û Meheli" de bûn. Me tev 15 salî bi rêberiya Elî Eskerî di çiyayên Kurdistana Başûr de pêşmergetî kir. Di van 15 salan de têkoşin û şer gelek dij-

war derbas bû. Dema dî-rokê sala 1974'an nîşan dida hêzên Mele Mistefa peşilîn, qeweta wan kêm bû û ji ber bêmecaliya xwe Mele Mistefa derket, çû Amerîkayê. Hêza ku me di nav xwe de çêkiribû, ew jî ji hev belav bû. Ez û hinek hevalên xwe çûn Kurdistana Îranê, bajarê Qesra Şerîn. Qismek ji me çûn Kurdistana Bakur, hinek ji wan jî revîyan Kurdistana Rojava (Sûriye)

**Naskirina Têkoşina Rizgariya Bakur (Partiya Mirovahiyê)**  
Piştî 2 salan (1976) min malbata xwe anî Kurdistana Bakur, herêma Qezê (Qoser), piştî hatina min a Qoserê, min dît ku di nav hinek hêzan de lihevixistin çêdibin (KUK û APO'ci - wê demê PKK ava nebûbû, di nav gel de bi vî navî dihatin nasîn). Di navbera 2-3 salan teki-liyê min ê PDK'ê hêdî hêdî ber bi qelsbûnê ve diçûn, dawiyê jî min dev ji PDK'ê berda. Ji ber ku pêşketina wê zehf xurt bû, ez ketim nava Têkoşina Neteweyî ku hêdî hêdî pêlên xwe fireh û xurt dikirin. Ez di sala 1980'an de, dema cunta-ya 12'ê îlonê, dîsa rabûm çûm Kurdistana Sûriyeyê. 2 salan li Sûrî di nav dozê de mam. Piştî 2 salan di sala 1982'an de ez zivirîm hatim Qoserê,

lê belê ji ber ku zilm û zordariya dewleta tirk her diçû li min zêde dibû, ez jî di sala 1984'an de di destpêka şerê çekdarî de hatim bajarê E-deneyê.

Ji ber ku hûn 40 sal in di nava doza Kurdistanê de ne; hûn dikarin rewşa beriya sala 1984'an ango berî şerê çekdarî û Têkoşina Neteweyî ku îro li Kurdistanê dibe, bidin ber hev. Pişt re jî têkoşina Başur û Bakur berawird (miqayese) bikin?

- Ez di sala 1955'an de ketim nava dozê. Me li Sûriyeyê, Iraqê û Îranê mamostetî dikir, têkoşin dikir. Me li gorî xwe rîya rast û dirust nîşanî gelê xwe dida, me dixwest gelê me jîr û zana be. Lê piştî em hatin Kurdistana Bakur û em ketin nava doza nû, tevî wê zanebûna xwe jî, me xwe zana nedidît. Li Başûr em mamostê û zana bûn jî, me baş nizanibû doza me ji bo çî ye. Piştî ku em ketin nav doza nû, bêhtir me xwe nas kir. Têkoşina ku me ewçend sal li Kurdistana Başûr dabû em lê poşman bûn. Ji ber ku doza Başûr jî bo menfaeta beg, şêx û axan bû, ne ji bo gelê kurd bû. Belê me li ser navê gelê kurd û Kurdistanê têkoşin dikir, lê em bi kêrî beg, şêx û axan dihatin. Rişma me di destê wan de bû... Piştî naskirina

### AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me Divê

	Li Hundir	Li Derve
<input type="checkbox"/> 3 Meh	<input type="checkbox"/> 550.000 TL	<input type="checkbox"/> 45 DM
<input type="checkbox"/> 6 Meh	<input type="checkbox"/> 1.000.000 TL	<input type="checkbox"/> 80 DM
<input type="checkbox"/> 12 Meh	<input type="checkbox"/> 1.800.000 TL	<input type="checkbox"/> 150 DM

**Bedelê Abonetiye ez radizînim**

**Li Tirkîyê** - Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Hesap No: 1100264-1

**Li Derve** - Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

**NAV Û PAŞNAV** : .....  
**NAVNIŞAN** : .....

**Navnişana Welatê Me**  
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu / İST.  
Tel-Fax: 293 53 19 - 245 29 91

doza nû, hevsara me yê ku di destê wan de bû, kete destê me. Ji sala 1984'an bi vir de êdî em zanin ku qedera me, rastiya me û bîr û baweriya me di destê me û di destê doza nû de ye. Dara jiyane ku beriya 10 salan hişk bûbû, îro em dibînin ku şîr dibe, şitlên wê bedew dibin.

**Ji bo welatekî azad û serbixwe hûn çî difikirin?**

- Em hêvî dikin ji yezdanê pak. Li Kurdistanê îro em gihîştine qonaxên pêşketin û hebûna xwe. Ev 750 sal in ku ji dema Silehedînê Eyubî ve em bindest in. Ereb, tirk û farisan em kirine 4 parçe.

Lê belê îro, baweriya me her diçe zêde dibe. Bêguman gelê kurd ev 3000 sal in ku serok û rêberêkî wiha jîr, zana û têkoşer nedîtine. Ji ber vê yekê em xwe pir bextewar dibînin, bi rêber û rêzanên xwe, bi enî, al û partiya xwe. Gelê kurd barê giran ji ser piştî xwe avêtiye û ber bi Kurdistaneke azad û serbixwe ve diçe.

**Seyda em ji bo van agahdariyên heja ji we re pir spas dikin.**

- Bi hêviyên, hevpeyvînen di Kurdistaneke azad û serbixwe de, ez ji xebatkar û xwendevanên Welatê Me re spas dikim.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ



## WELATÊ ME

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
ROZA Basın ve Yayıncılık  
San. Tic. Ltd. Şti. adına  
Xwedî (Sahibi)  
**Aynur BOZKURT**

Gerînendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
**Mazhar GÜNBAT**

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran  
(Yazışleri Müdürü)  
**Metin AKSOY**

Berpirsiyarê Nûçeyan  
(Haber Sorumlusu)  
**Suut KILIÇ**

Redaktor  
**Sami TAN**

**NAVNIŞAN (Adres)**  
Ayhan Işık Sok. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL

**TEL-FAX**  
293 53 19 - 245 29 91

**ÇAPXANE**  
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

**NÜNERİ**  
(Temsilcilikler)

**Suriye**- Jan Dost  
Fener Rojbiyanî  
**Berlin**- Silêman Sido  
Sirwan Reşid  
49-30-69 00 26 95  
**Hannover**- Selim Biçûk  
49-5721-813 60  
**Hamburg**- A.Hekim Gülsün  
49-40-40 33 88  
**Munchen**- Mahmut Gergerli  
49-871-670 884  
**Badenwurttemberg**-  
A. Rahim Ayaz  
49-75453258  
**Amsterdam**- Cotyar Zaxoy  
31-20-613 07 66  
**Paris**- M.S. Ayçiçek  
33-1-48000401  
**Atina**- Ferhan Zêbarî  
30-13634905  
**Bruksel**- Medenî Ferho  
32-16-49 07 67



# 'Gelê kurd barê giran ji ser piştta xwe avêtiye

**Piştî ku em ketin nav doza nû, bêhtir me xwe nas kir. Têkoşîna ku me ewçend sal li Kurdistanê Başûr dabû, em lê poşman bûn. Ji ber ku doza Başûr ji bo menfaeta beg, şêx û axan bû, ne ji bo gelê kurd bû. Belê me li ser navê gelê kurd û Kurdistanê têkoşîn dikir, lê em bi kêrî beg, şêx û axan dihatin. Rişma me di destê wan de bû...**

**Seyda em dixwazin Swe nas bikin.**

- Ez di sala 1935'an de piştî koçberkirina bav û kalên min ku ji Bakur koçî Kurdistanê Sûriyeyê, ji wir ji koçî Başûr bûne, li Dihokê hatime dinyayê. Em ji Kurdistanê Bakur, ji gundê Tizyanê ya Mêrdînê ne. Em ji malbata Seyîdê Mala Şêxê dinê ji ziryeta Zeynelabîdîn ê Nîsêbînê ne. Ev 40 sal in ku ez di nava doza Kurdistanê de me, min 15 salî pêşmergekî kir li Başûr. Li Sûriyeyê bi gelek rewşenbîrên navdar re têkiliyên min çêbûn. Li paytexta Sûriyeyê Şamê li taxa Salihiyê ya kurmancan ez û Osman Sebrî gelek bi hev re man. Ez katibê Osman Sebrî bûm. Di dîroka Kurdistanê de cara yekemîn min pirtûka Memê Alan bi tîpên erebî nivîsandibû, Kamu-

ranê kurê Bedirxan ji ev pirtûk biribû Frensayê û wergerandibû kurmançî...

Bav û bapîrên we ji ber çî ji Kurdistanê Bakur derketibûn. Ango koçberiya we ya serxetê ber bi binxetê ve ji bo çî bû?

- Bapîrê min Seydayê Mele Mihemedê Elî, di dema Serhildana Şêx Seîd de piştî bisernetina Şêx Seîd ji ber rejîma Atatürk reviyay û çûn Amûda Sûriyeyê. Ne tenê bav û bapîrê min, hevalên bapîrê min Doktor Nûrî, Doktor Nafîz (ji Palo) ji piştî vê bûyerê direvin tî Amûdê. Wê demê Şêx Evdirehîmê birayê Şêx Seîd, Şêx Mizbeh û nêzikî 40 şêx bi Şêx Seîd re şeva cejna qurbanê li Amedê taxa Seyrantepeyê tîne bidardekirin (daleqandin).

**Belê piştî dardekirina Şêx Seîd û şêxên din, ew kesên ku neketibûn dest, we got reviyabûn Amûdê, em vegehin ser Amûdê, wê çaxê çî dibû li wir?**

- Li Amûdê heta 4-5 salan jiyana wan kesan bêdeng didomiya. Piştî 4-5 salan hin kesan ji wan biryarek standin ji bo ku vegehin Bakur. Şêx Evdirehîm, Şêx Mizbeh Silhedînê kurê Seyitxanê ker hatin Bismilê, lê belê hevalek ji wan qetiya û çû ew îxbar kirin. Dewletê avête ser wan, ew di nava zad de şewitandin. Di nav wan kesên ku di nav zad de hatibûn şewitandin de Elî Begê Stewrê ji hebû. Lê belê Şêx Mizbeh û Silhedînê kurê Seyitxan xwe



**Mele Evdirehmanê Tizyanî**

avêtin nava avê û ji şewitandinê filitîn. Çûn gundekî beraviya Bismilê, gundiyan li wan xayintî kir, ew girtin û teslîmî qereqola Tepê kirin. Di qereqola Tepê de dotira rojê serê wan hate jêkirin. Dema li Bismilê ev bûyer dibin, kalikê min Mele Mihemed Elî, Mala Çelqe (ku ji Mêrdînê koçî Sûriyeyê bûne) û Seîd Axayê Deqorî bi hev re têkiliyan datînin. Wê çaxê leşkerên frensî li Sûriyeyê

bûn. Ji ber vê yekê wan kesan li frensiyan xistin. Wê çaxê Frensayê rabû li Amûdê mala Çelqê girt û ew teslîmî Tirkiyeyê kirin. Mala Çelqê tînin Mêrdînê "Newala Qutê" tevan gulebaran dikin û dikujin. Kalikê min û Seîd Axayê Deqorî ji ber ku nekevin destê frensiyan direvin diçin Kurdistanê Başûr, bajarê Dihokê.

**Ji dayikbûna min Sala ku bapîrê min,**

Seîd Axayê Deqorî û bavê min Mele Ehmed tîne Dihokê cem Seîd Axayê Dostikê, mêjû sala 1935'an nişan dide û wê çaxê ez tîme dinê, wê demê li Iraqê îngiliz hebûn. Ez 2 salî bûm, bapîrê min û apê min Mele Dewrêş li Dihokê dimînin, bavê min Mele Ehmed vedigere Sûriyeyê gundê Tirbespiyê (girêdayê Amûdê ye), li wir min dest bi medreseya dînî û xwendina erebî kir. Di sala 1950'an de

dema ez 15-16 salî bûm min dest bi dibistana bilind kir, di sala 1955'an de ji ez bûm mamoste.

Piştî saleke din (1956) Şukru Qewedlî (Reîsê Şamê) û Cemal Evdilnasir dewleta xwe kirin yek. Pişt re ji dest danîn ser PDK'ya Sûriyeyê.

**Destdanîna ser PDK'ê û girtina azadîxwaz û rewşenbîran**

Ji me gelek kes girtin. Ez, Osman Sebrî, Qedrî Can, Dr. Nûrî, kurê Osman Sebrî Welato û gelek ronakbîrên din. Em tev girtin. 40 rojî em di qeboyê" (hucreyên bi 10 metroyî di bin erdê de) de man, piştî 40 rojî em ji qeboyê derxistin û em avêtin "mezrê" (hucreyên di nav avê de) 60 rojî ji em li vê derê man. Pişt re ji bo îfadekirinê em anîn Şamê.

Em anîn "Lijneya Sûri El Siyaset" (wargeha muxabereta dadgeha Sûriyeyê). Em di sala 1957'an de berdan, em reviyay çûn Iraqê bajarê Mûsilê. Ji xeynî min, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Qedrî Can, Dr. Nûrî, em nêzikî 1400 xwendevan, ronakbîr û hwd. ji hatibûn Mûsilê. Wê demê (1957) Ebdilkerîm Qasim, li Melîk Feysel, Ebdilillah û Nûrî Seîd îngilap kirin. Ez û 400 kes dîsa hatin girtin. Ez û Cegerxwîn piştî demeke kurt berdan. Ji ber ku Osman Sebrî, Qedrî Can û Dr. Nûrî di rêxistinê Kurdistanîyan de bûn ew bernedan û teslîmî dewleta Sûriyeyê kirin.

**SALIHÊ KEVIRBIRÎ Dûmahîk rûpel 15**

**elinewêrek**

